


## Jinika jîr...

Dayê nizam bextê min e, yan jî bêbextiya hinekan e! Ez bi ku de herim, çi bikim jî hemû caran bêbextiya hinekan derdikeve pêşiya min. Em gundî, li gundê xwe û di navbera xwe de di hemû kar û baran de alîkariya hev dikin, her kesek destê xwe diavêje karekî... *Kewê Redkan / R.10*



## Dax

Helbestvanê gewre yê xortanîya min Vladîmîr Mayakovskî, di serhilbûna xwe ya Amerîkayê de kat kiribû; "Min hêja Chicago dît û destana xwe raberî chicagoyîyan kir. Ne mizicîneke mizawir li rûye wan hasil bû, ne jî milikê xwe hilkirin." ... *Şener Ozmen / R.11*



## Guh pereşût in!

Mirov, li pey wateyan in. Bi vê taybetîya xwe, ji zindîyên din vediqetin. Wate, têgehek e ku tenê bi mirovan re eleqedar e. Ajal, her çi bin, ew in, wek xwe ne. Bi ajoyan dijîn. Hewcedarîya wan bi çandê tune û bi fîlozofîyê jî, jiyana xwe tevlîhev nekirine... *Helîm Barîn / R.8*

Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

3 - 9 Tebax 2020
Hejmar: 33
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

## Lîstikên xwe bi xeyalan dixemilînin

Dema zarok tê gotin, tişta ku destpêkê tê bîra mirov lîstik û paqijiya dil e. Haya zarokan ji pergala kapîtalîst tune ye û di nav wê de qirêjî nebûne; ji ber vê jî ew bedewiya jiyanê bixwe ne. Ji bo zarokan tişta herî xweş lîstina bi hevalên xwe yên zarok re ye; ji sibê heta êvarê dikarin bilîzin. Heta derengiya şevê ku bikevin hembêza dayika xwe jî li lîstîkê wê dotira rojê bilîzin û teşqeleyên bikin difikirin...*Çavreş Zamanî / R-6*

# Gotin sar e



Ev êş û ferman gelek caran hat ziman. Lê aliyekî xwe yê kêmmayî heye ku gotin di qirika mirovan de dibe girêk. Nivîskar Derya Ozdemîr jî li ser Komkujiya Şengalê ev tişt nivîsî: "Mirov bi xem û êşên gelê xwe, xizanî, birçîbûn, azadî û pirsgirêkên gelê xwe bi bîr dibe û pê diêşe û dibêje. Gelek car tên gotin ku gotin xelas dibin, na gotin xelas nabin, lê gotin sar in, gotin bêwate ne ango têra vegotina tiştên mirov jiyane nakin. Gotinên jinên êzidî jî sar in, kêm in, bêwate ne. Ango gotinên wan têra pênasekirin û ravekirina êş û tiştên jiyane, tiştên hatine serê wan nakin."... *Derya Ozdemîr / R - 2*

## Eniya Aştî û Azadiyê

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê piştî ku partiyên di Rêveberiya Xweser de cih digirin, ji bo hevdîtinên yekitiya neteweyî, bi navê Partiyên Yekitiya Niştîmanî ya Kurdî (PYNK) ava kirin, Encûmena Niştimanî ya Kurdên Sûriyeyê (ENKS), jî bi hin hêzên kurd, ereb û suyanî re Eniya Aştî û Azadiyê ava kir. Di daxuyaniya der barê avakirina eniyê de hat gotin ku armanca eniyê avakirina Sûriyeke demokratîk û nenavendî ye... *R. 3*

**Bêedalet Aştî Nêbeno** — **Av. Cemile Turhalli** — RÛPEL - 9

## Jineolojî zanista xwegihandina heqîqetê ye

Endama Komîteya Jîneolojiyê ya Ewropayê Necîbe Qeredaxî der barê jineolojiyê de ji rojnameya me re axivî. Qeredaxî tîne ziman ku jineolojî zanisteke civakî ye, wateya xwe zanista jinê ye lê bêguman jin ne tenê weke hebûneke biyolojî weke hebûneke civakî, siyasî , çandî ku hemû zindîtiya gerdûnê di xwe de dihewîne lê di qada zanistên heyî de weke mijara zanistê nehatîye dîtin. Qeredaxî ev tişt anî ziman: "Li hemû beşên Kurdistanê jineolojî xebetên cuda û di astên cuda de bi rê ve dibe. Di asta akademiyê de xwe ava kiriye, lêkolînên sosyolojî kiriye, dewreyên perwerdeyan vekirine, bingeha fakûlteya jineolojiyê ava kiriye û hwd." .... *Hevpeyvîna Bêrîvan Kayi / R.4*

## Dengê bi rêya kilaman olan dide...

Dengbêjî olana dengê enderûn ê mirov e ku bi awayekî rewnaq û zelal ber bi deryaya hestan ve rê digire û xwe digihîne çemê herikbar ê vegotina peyvan. Peyvên ku hewceyî bi nivîsîn, tomarkirin û şîrovekirinê dikin.

*Zehra Mohammedzadeh / R.2*

## Nîqaşên li ser pirsgirêka kurdî

Di van rojan de ku şerê li dijî kurdan dijwar bûye û ji gelek aliyan ve êrîş bi ser wan ve tên, nîqaşên der barê çareseriya pirsgirêka kurdî jî gur bûne. Li aliyekî partiyên Gelecek û DEVA'yê ku ji AKP'ê veqetiyan û ji aliyekî ve jî serokê giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglû qala çareseriya pirsgirêka kurdî dikin. Lê balkêş e her sê alî jî bi wêrekî tespîta pirsgirêkê nakin... *Qedrî Esen / R.3*

## Qidika Qidîşkê

Rîtuela me ya qurbanê, Qidika Qidîşkê, ji bo derbasbûna kew (leke)eke zikmakî ye ku li gorî tibê bi piranî di pişt an jî kemaxa zarokên rengesmer de tê dîtin û hetanî 4 saliyê jî ji ber xwe ve wenda dibe... *Alik X / R.8*




## Hebûna kurdan...

Li ser zemîna Sûriyeyê gelek dewlet neçar in ku bi hev re di nav têkiliyan de bin. Ev tekiiyên ji ber bêîstiqrariya rewşa herêmê ya leşkerî û polîtîk ve tên pêşxistin, bi xwe re şert û mercên nû ava dikin. Di nav van hevsengiyan de dewleta tirk jî dixwaze li herêmê bibe hêza sereke. Lewma ji bo li vê qadê Rûsya û Îranê bê bandor bihêle, di nav lîstikên kirêt de ye. Em hemû dizanin ku armanca Erdogan a sereke xurtkirina desthilatdariya xwe ye... *Felemez Ulug / R.7*

## Ferman an jî çirûskek hêvî

Bi rastî li ser vê axa qedîm heta niha gelek gel û bawerî hatin û çûne lê belê yek ji van gelên qedîm li hember her cure zilmê li ber xwe da û heta roja me hebûna xwe domand. Her çiqas di roja me de di nav gelên heremê de hin cudahî, di aliyê baweriyê de hin taybetmendî hebin jî di cewhera xwe de tev yek in....




*Mem Farqînî R.5*

# Serdema aqil û bazarên jinan

**Gotin sar e; jinên êzidî gundên wan hatin şewitandin, malbatên wan hatin qetilkirin. Gotin sar e; jinên êzidî hatin revandin û qetilkirin. Gotin sar e; jinên êzidî li bazaran bi dehan car hatin firotin. Gotin sar e; jinên êzidî bi dehan car hatin tecawizkirin**

Derya Ozdemîr

Rewşenbîr û fîlozofên ewropî di sedsalên 17 û 18'an de, ji aliyê felsefe û zanyariyê de fikr û ramanên xwe bi tevgerên ronesans û reformê danîn holê. Armanca van tevgeran azadî û bextewariya gelên xwe bû. Ev dem wekî serdema aqil an jî serdema rewşenbîriyê hate binavkirin. Bîrewer û fîlozofên demê bi zanebûn dixwestin gel bi rêberiya aqil ji fikr û ramanên serdema tarîtiyê derxînin. Di serdema tarîtiyê de gel di bin serdestiya ola mesîhî de dihat kuştin, jin weke pîrebokan dihatin binaxkirin û dihatin şewitandin; gel di bin zextên aboriyên mezin de tî û birçî diman û bi hûkmê olê dihatin xapandin. Piştî vê serdemê bi derketina çapxaneyan û zêdebûna pirtûkan pêşî serdema aqil vebû û vê bi xwe re pêşketinên endustriyê anîn. Bi hatina endûstriyê re rê li ber fabrîqeyên çek û amûrên şerên modern vebû.

'Serdema Aqil' yek ji navê pirtûkên J. P. Sartre ye ku ji sê pirtûkan pêk tê û wekî rêyên azadiyê bi nav dike. Di sala 1941'an de dinivîse. Salên Şerê Cîhanê yê Duyemîn in. Sartre di vê pirtûka xwe de behsa çîroka Marcelle û Mathieu yê di salên 1930-1940'an de dike. Salên êş, komkujî, hebûn û nebûn, xizanî û birçîbûnê ne. Dîsa sal û serdemên tarîtiyê ne lê vê carê tarîtî bi rêberiya aqil û ferasatê hatiye. Îroniya serdema aqil û tanq, top, makîne û çekên kîmyewî ne vê carê. Komkujiya mirovan bi aqil dibe pêk tê. Jan û êşên lehengên vê pirtûka Sartre mirov dikare di xwe de jî bibîne.

Di emrê mirovan de jî du serdemên bingehîn hene; yek serdema zarokatiyê yek jî serdema aqilbûn ango kamilbûnê ye. Di serdema aqilbûnê de mirov bi bîr dibe, difikire, dîêşe û dibêje. Mirov bi xem û êşên gelê xwe, xizanî, birçîbûn, azadî û pirsgirêkên gelê xwe bi bîr dibe, pê dîêşe û dibêje. Gelek car tên gotin ku gotin xelas dibin, na gotin xelas nabin lê gotin sar in, gotin bêwate ne ango têra vegotina tiştên mirov jiyane nakin.

Gotinên jinên êzidî jî sar in, kêm in, bêwate ne. Ango gotinên wan têra pênasekirin û ravekirina êş û tiştên jiyane, tiştên hatine serê wan nakin. Gotin sar e; jinên êzidî gundên wan hatin şewitandin, malbatên wan hatin qetilkirin. Gotin sar e; jinên êzidî hatin revandin. Gotin sar e; jinên êzidî hatin qetilkirin. Gotin sar e; jinên êzidî li bazaran bi dehan car hatin firotin. Gotin sar e; jinên êzidî bi dehan car hatine tecawizkirin. Gotin sar e; jinên êzidî bi zordarî ducanî bûn û dergûş bi zordarî ji ber xwe kirin. Gotin sar e; jinên êzidî vegeriyan lê civaka wan, bav û birayên wan, ew qebûl nekirin. Gotin sar e; jinên êzidî mecbûr man laşên zarokên xwe yên ji tîbûn û birçîbûnê mirin li dû xwe bihêlin. Gotin sar e; jinên êzidî bi rojan tî û birçî mane, pêsîrên wan bêşîr mane û dergûşên wan birçî mane, koçber bûne lewma nikarîbûne ji zarokên xwe re li gorî dilê xwe xwarinekê çêkin, zarokên xwe li zivistanan ji sermayê, li havînan ji germahiyê nikarîbûne biparêzin. Gotin sar e; jinên êzidî îzolekirî ne, derûniyên wan xirab bûye, bi tirs û xof in, bi hesreta xeweke kûr in, ji aliyê hiş û mejiyê xwe ve parçebûyî ne, xwediyê laşekî îşkencekirî û tije şopên tecawizê ne. Gotin sar e; jinên êzidî xwediyê bîreke şikestî ne, bîreke tijî êş û hesret e. Gotin sar e; jinên êzidî di navbera jiyan û mirinê de mane, jiyan hilbijartine li ber xwe dane lê jiyan ji mirinê xirabtir bûye û xwezî li miriyan anîne. Gotin sar e, kêm e û bêwate ye.

Jinên êzîdî koçber bûn, cih û warên xwe terikandin û meşiyan, bi rojan tî û birçî meşiyan ji hêleka welatê xwe çûn hêleke din a welatê xwe. Ji komkujiyeke rojeke germ a wê hêlê direviyan ber bi axa ku di rojeke sar de komkujiyeke din lê qewimîbû. Berê xwe dabûn Roboskiya ku deng û qêrînên zarokên parçebûyî jê dihat. Roboskiya ku axa li ser gora wan zarokan zûha nebûyî. Berê xwe dabûn axa ku bêhna xwînê jê dihat. Niha her du hêlên welatê jinên êzidî bêhna xwînê jê dihat. Di serdema welatên din li fezayê lêkolîn dikirin, li welatekî taştê li welatê din firavîn dixwarin zarok, ciwan, kalepîr û jinên êzidî ji aliyê hovên sedsala 21'ê ve dihatin qetilkirin, serjêkirin, li kolanên bajarên modern! Dihatin firotin. Li ber çavê hemû dinyayê û bi alîkariya dewletên serdest ên ku zanyariyê pesnê xwe didan cihên pîroz ê miletekî dihatin bombekirin, çete û rêxistinên hov miletek qetil dikir û di gorên komî de diavêtin ser hev, keç û jinên êzidî jî li bazaran difirotin.

Ev rûreşiya serdemê ye. Li hember hêviyên asta mirovahiyê, rewşa gelê kurd û jinên êzidî hemû zanistan û hişmendiyan gotinan bêwate û pûç dikin.

Serdema aqil û serdema tarîtiyê li bin guhê hev ketine. Serdema aqil êdî nabe sedema ronahiyê. Êdî her du hev xwedî dikin. Di bin rêberiya aqil û peran de xwesteka desthilatdariyeke bêdawî û tarî ava dibe. Xeyala bihuşta wan dibe dojeha gelê û jinên me. Dema ew di rêberiya aqil û endustriya xwe de di qesr û qonaxên xwe yên bêhempa de rûdinin, mey û şeraba xwe vedixwin, hesab û kîtabên desthilatdariya xwe dikin, behsa kirîn û firotina çek, petrol, tanq û topên xwe dikin, em li ser axa xwe rastî erîşên hovane û dermirovahî tên. Di serdema aqil de em bi aqil ji aqil derdikevin. Lê dîroknasên sedsalên pêşerojê dê şerm û rûreşiya wan, berxwedan û rûmeta jinên êzidî û gelê me binivîsin. Ev berxwedana li hemberî vê hovîtiyê dê di nav rûpelên dîrokê yên binaxkirî de nemîne. Di dawiyê de em gotinên xwe bi Sartre dawî bikin, di wê pirtûka xwe de Sartre dibêje 'heta mirinê mirov mehkûmê azadiyê ye.'

Heta mirinê jin û gelê me jî mehkumê azadiyê ne, wekî ku her car li me diqewime, em bi berxwedanên xwe sax dimînin û bi berxwedanên xwe dijîn. Em ê bi berxwedanên xwe ji bin serdestî û desthilatdariyên dewlet û rexistinên hov xelas bibin û azad bin.





Zehra Mohammedzadeh

## Dengê bi rêya kilaman olan dide...

Dengbêjî olana dengê enderûn ê mirov e ku bi awayek rewnaq û zelal ber bi deryaya hestan ve rê digire û xwe digihîne çemê herikbar ê vegotina peyvan. Peyvên ku hewceyî bi nivîsîn, tomarkirin û şîrovekirinê dikin lê ji ber gelek sedeman pêkan nebûye ku ev yek bê kirin û di bîra mirov de ev peyv li du hev hatine xîzkirin, nehatine jibîrkirin. Mêjî vê carekê bigire û êdî wê ji bo heta hetayê ji bîr nebe, bi ser de jî bi bûyer an jî diyardeya ku ev peyv pê hatine avakirin, wê rastiyê zindî bike û wisa bistrê.

Jixwe li Kurdistanê –di her pêvajoyeke dîrokê de- bûyer û rewşên aloz ên siyasî, civakî, leşkerî û hwd. zêde rû didan. Nemaze bûyerên biêş ên civaka kurd gelek caran neçar dihişt ku jiyana derbiderî bijî… Ji ber vê çendê jî her bûyer an jî serpêhatiya ku di serê wan re derbas bûye ji bo neyê jibîrkirin, bi rêya çîrok, zêmar, heyranok û dengbêjiyê hatine veguhastin.

Ev veguhastin mîna dilopên bîr û hişeke dewlemend a ji ferhenga gotinan, wisa bi rengê heskirin, kerb, evîn, koçberî û derbiderî, zilm û kuştinê, bi zêmar, meselok, çîrok, heyranok, kilam û stranan girtiye û wisa hatiye. Ev bîr û hişê dewlemend ê dîroka Kurdistanê pêk tîne, bi deng kariye bibe rê û rêçek ji vê hafizeyê re.

Di her stran û kilamekê de bi heman baldarî û hostayî nêzikatî derdikeve pêş. Mînak dema kilam an jî straneke şer dihat gotin, ji qehremanî, cengaweriya wî/wê bigire heya xwezaya kes lê, yan jî bûyer lê qewimî, ji salixkirina kes bigire heya bedewiya wî/wê, her tişt di nav aheng, xweşikî û wateya wê de dihat behskirin û wisa dihat gotin. Her tişt di tema wê de ji guhdar re dihat vegotin; derdê evînê, koçberî, neheqî, nexweşî û kuştin, gelek mijar û serpêhatî bi awayên cihê, bi nêrandinek hunerî dihat veguhastin. Helbet ev bi serê xwe hunerek e, hunerek resen a vegotinê. Jixwe di dîroka Kurdistanê de mînakên wê pir in. Û ev hunera devkî ku rolek girîng di parastina çanda kurdî de lîstiye, bi şêweyên cuda kariye deriyên nû ber bi hunera devkî ya kurd ve jî vebike.

Bêguman kevneşopiya dengbêjiyê biqasî rolek girîng di çanda kurdî de lîstiye, kariye di pêşxistina wê de jî xwedî rol be. Bi her awayî kariye rewşa civaka kurd vebêje, nexasim jî di anîna ziman a şêweya jiyana civakî de xwedî vegotinek cihê ye. Gelek caran ji bo ku mirov rewş û kevneşopiya civak an jî erdnîgariya ku kurd lê jiyane bizanibe, hewce ye mirov li wan dengan bizivire û bi baldarî guhdar bike. Nemaze rewşa jinê, bandor û nêzikatiya jê re hatiye raberkirin...

Her kilam û stran di nav xwe de rastiyekê vedihewîne ku guheke baldar dikare li pey rastiya van dengan biçe û hay li şêweyê jiyan, kevneşopî, irf û adetên demên cihêreng bibe. Dengbêj bi dengekî zîz û bibandor distrê. Hewl dide rewşê wek hatiye jiyîn ragihîne û jixwe hewceyî bi ser zêdekirinê nabîne. Rewşa hatî jiyîn, an jî bûyer, bi têra xwe bes dibîne ku vebêje û ragihîne. A rast armanc bixwe jî ew e, yanî tişta heyî bi awayek herî rast û zelal ragihandine. Jixwe ma tişta di dengbêjiyê de herî hêja û binirx jî ne ew e ku tişta hatî jiyîn bikare veguherîne deng û zindî bike. Û bûyera qewimiye bi dengê gur û geş ragihîne.

Wek tê zanîn der barê gelek bûyerên dîrokî de belge nînin. Hin bûyerên qewimîne ger bi rêya van kilam û stranan nebin, dibe em pê nezanibin jî. Yan jî wek me di serî de jî ragihand rewşa civaka me ji hêla civakî û çandî ve, ka çawa jiyane, dibe em xwedî agahiyên kêm bin lê ev kilam ramanekê didin me. Ji bo wê jî her kilam û stran di asta lêkolînên berfireh de ne. Ew ne tenê stran in, tiştên hatine jiyîn, hafizeya civakekê ne û bi rêya dengan hewl tê dayîn tiştan ji me re bibêjin. Dengên ku yekser xîtabê ruhê mirov dikin. Mîna dengên ku bi rêya kilaman di ruhê mirov de olan didin...

Li rojhilatê Kurdistanê, nexasim herêma Urmiye, Selmas, Mako, Xoy û hwd. hîn jî ev çanda veguhestina dengan pir bi hêz e. Hîn jî gelek bûyer û rewşên tên jiyîn bi rêya dengbêjan, nexasim dengbêjên jin ve tên vegotin. Di roja îroyîn de jî dayikên kurd dema ku zarokên wan tên darvekirin, êrîşek li hemberî wan çêdibe, kuştin an jî bûyerek dilşewat rû dide, bi dengê xwe yê zîz vê qêrînê vediguherînin dengekî bihêz. Di şînê de, di wê kêliyê de jinek dest davêje gotinê û jinên din jî li wê dizivirînin. Ciwanî, egîdî, lehengî û bedawiya wî, dîsa bûyera bi serê wî de hatî bi awayekî zelal tînin ziman. Bi taybetî jî ger ev kes ji aliyê dewletê ve hatibe qetilkirin, rastiya dewleta kujer û qatilan, zilm û zorê jî pir baş şîrove dikin. Yanî jin û dayikên kurd hîn bi hêza dengan bawer in, di vê sedsalê de ger nivîsîn û tomarkirin bi awayên cihê bi pêş ketibin jî, ew dixwazin bi rêya dengan xwe bigihînin nifşên nû… Ew di ferqa sihra dengan de ne, bandora ku dide çêkirin û ji bo wê jî êş, zilm, keder û xweşiyên xwe bi kilaman dihûnin.

Ger êdî stran û kilamên evînî û jinê pir kêm bên gotin jî hîn jî gelek dengên bihêz behsa rewşa jin tê de ye dikin; behsa êş û derdên ji ber evînê dikin, bi awayekî bi van kilamên xwe li dijî vê rewşê derdikevin. Lê mixabin bi gelemperî ev kilam bi kes re dimîne û nayên belavkirin; ji ber ku ev deng êdî di nav malê de hatiye hepskirin û li gor tê xwestin nagihêje derdoreke berfireh.

Yek ji dengên ciwan û bihêz ên herêma Makoyê jî Gulistan Talî Cinganlo bû ku di temenekî ciwan de ji nav me koç kir. Xwedî dengekî bibandor, zîz û zelal bû. Dikarî di wê kêliyê de bûyera tê jiyîn veguherîne dengekî bihêz û bistrê. Di kilamên xwe de ew êş, serpêhatî û bûyer baş rave dikir. Jixwe dengê wê bandorek cuda li ser kilaman çêdikir. Xwedî dengeke efsûnî bû. Bi salan beriya vê, dema ku ew hîn nûciwan bû, şansê nasîna min a bi wê re çêbû (di demekê de ku li herêma Urmiye û Makoyê me lêkolînên li ser dengbêjiyê dikirin) ku wê kilamek bixwenda, kilamek li ser jiyan, rewş û serpêhatiya diya xwe (ez bawer im ev kilam ji aliyê dayika wê bixwe ve hatibû çêkirin). Ger her peyv di bîra min de nebe jî, bedewî, zehmetî û êşên diya xwe pir baş dianî ziman.

# Nîqaşên li ser pirsgirêka kurdî

**Di rojên dawîn de di serî de CHP beşeke partiyên muxalefeta Tirkiyeyê çareseriya pirsgirêka kurdî nîqaş dikin lê wekî her carê dîsa nîqaşa partiyan bi sînor e û rastiya pirsgirêkê venabêjin. Ew di neçareserkirinê de israr dikin**

Qedrî Esen



Di van rojên dawî de ku şerê li dijî kurdan dijwar bûye û ji gelek aliyan êrîş bi ser wan ve tên, nîqaşên der barê çareseriya pirsgirêka kurdî de jî gur bûne. Ji aliyekî partiyên Gelecek û DEVA'yê yên ji AKP'ê veqetiyan û ji aliyekî ve jî serokê giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglû qala çareseriya pirsgirêka kurd dikin. Lê balkêş e, her sê aliyên dengê ji bo çareseriyê ji wan bilind dibe jî, bi wêrekî tespîta pirsgirêkê nakin û hewldanên xwe yen ji bo vê yekê tenê bi gotinan bi sînor dihêlin.

Ev nîqaş ji nişka ve destpênekirin. Weke tê zanîn li başûr, rojava û bakurê Kurdistanê li dijî kurdan operasyonên gelek dijwar pêk tên. Armanca van operasyonan jî destpêkê jiholêrakirina pêşengên Tevgera Azadiyê ya Kurdî, piştre jî bi tevahî tekbirina Tevgera Azadiyê ya Kurdî ye. Ji bo vê yekê ji meha hezîranê ve operasyonên li başurê Kurdistanê hatine berfirehkirin. Di van operasyonan de welatiyên sivîl tên qetilkirin û xesareke mezin digihîje xwezaya li vir.

**Heman operasyon**

Li rojavayê Kurdistanê jî heman plan di dewrê de ne û tê gotin ku Tirkiye di nav hewldanên operasyona dagirkirina hin herêmên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Ji bo vê yekê endamên MÎT'ê li herêmê xebatan dikin û li benda derfeteke ji bo destpêkirina vê operasyonê ne. Heke nikaribe operasyonê bike jî wê ji bo hilweşandina yekitiya di navbera hêzên kurdî de tişta ji destê wê bê bike û nehile ku kurd bigihijîn aramiyê.

Dîsa li bakurê Kurdistanê jî rewş ji başûr û rojava ne cudatir e. Tevî ku her roj sozên qedandina "terorê" tên dayîn û di vê der barê de hin dane tên parvekirin jî dawî li operasyonên siyasî û leşkerî nayên. Li gelek herêmên bakurê Kurdistanê ku sala borî operasyonên leşkerî hatibûn lidarxistin û ji hêla Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylû ve hatibû ragihandin ku PKK'î li van herêman qediyane jî niha li heman deveran dîsa operasyon hatine destpêkirin.

**Ajoyên şer xizan dikin**

Di van operasyonan de zilmeke mezin li gelên herêmê tê kirin. Ji bo mayîndekirin û "xweşkirina" berdewama van operasyonan, daristan tên şewitandin. Deverên ku şewat li wan pêk neyê jî bi destê cerdevanan dar tên şewitandin. Bi van rêbazan hem kurd tên acizkirin hem jî xweza tê talankirin. Ev jî hêla mêjiyê dewletê yê operasyonel ve gef e. Ji bo çewisandin û sergirtina pirsgirêka kurdî tê kirin lê gelek jî baş tê zanîn ku hemû badilhewa ne.

Ev polîtîka çiqas kurdan bike zorê û wan ber bi rojên nexweş ve bibe jî bandoreke neyînî li tevahiya welat dike. Destpêkê jî bandor li aboriya Tirkiyeyê dike. Bi vê bandora neyînî ya li ser aboriyê aramiya welat jî têk diçe. Di encamê de civak xizan dibe û ajoyên şer jî roj bi roj dewlemend dibin. Ji ber vê yekê ye di rojên dawîn de dengê aciziya li dijî vê yekê bilind dibe û bi rêya nûnerên muxalefetê ji bo jiholêrakirina vê rewşê hin nîqaş tên kirin.

**Angaştên çareseriyê**

Serokê Partiya Demokrasî û Pêşveçûnê (DEVA) Alî Babacan û Serokê Partiya Pêşerojê (Gelecek Parti) Ahmet Davûtoglû ku beriya demekê ji AKP'ê veqetiyan û partiyên navborî damezrandin, tevî ku bi AKP'ê re bi salan heman polîtîka meşandin jî der barê vê polîtîkayê de îro rexneyan li AKP'ê dikin. Hem Babacan hem jî Davûtoglû qala hin mafên kurdan dikin û angaşt dikin ku heke bên desthilatê destpêkê di mijara 'hemwelatîbûna wekhev' de gav bavêjin.

Qaşo ji bo nîşandina jidilbûna vê yekê hesabên medyaya civakî yên kurdî vekirine. Her wiha ji bo perwerdeya bi zimanê kurdî jî hin tiştan dibêjin û diyar dikin ku ji bo wan perwerdeya bi zimanê kurdî ne pirsgirêk e. Tevî ku rexneyan li AKP'ê dikin û dibêjin ji ber polîtîkayên ku AKP dimeşîne welat ber bi faşîzmê ve diçe jî terka hin polîtîkayên ku ji hêla AKP'ê ve li dijî kurdan tên meşandin, nakin. Tiştên qal dikin bi sînor in û ji pêbaweriyê jî gelek dûr in.

**Soza Kiliçdaroglû**

Herî dawî serokê giştî yê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglû jî di nav hefteyê de soza çareserkirina pirsgirêka kurdî da! Kiliçdaroglû, got ku 40 sal in pirsgirêka kurdî heye û desthilatdaran pirsgirêk çareser nekiriye. Piştre jî got ku cihê çareserkirina pirsgirêkan meclis e û pirsgirêka kurdî jî di nav de pirsgirêkên demokratîkbûna Tirkiyeyê dê li meclisê çareser bikin. Her wiha got ku dê vê yekê bi gumhertina destûra bingehîn bike.

Kiliçdaroglû jî mîna Babacan û Davûtoglû bi tirs û bi sînor nêzî pirsgirêka kurdî dibe û qala çareseriya ku ji hêla kurdan ve tê xwestin nake. Her sê jî li gorî xwe li pirsgirêkê dinêrin. Çareserî wêrekî ye. Dema ku ev pirsgirêk bê çareserkirin wê pirsgirêka kurdî jî bi awayê ku kurd dixwazin bê çareserkirin. Kiliçdaroglû, pirsgirêka kurdî bi derketina Tevgera Azadiyê ya Kurdî (40 sal) digire dest lê dibêje wê şerê dewletê yê li dijî wê jî bi dawî neke.

Heke çareserî ev be, ev ne çareserî ye. Li şûna çareseriyê xapandin û xebata pêşiya hilbijartinê ye.



## ENKS'ê Eniya Aştî û Azadiyê ava kir

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê piştî ku partiyên di Rêveberiya Xweser de cih digirin, ji bo hevdîtinên yekitiya neteweyî, bi navê Partiyên Yekitiya Niştîmanî ya Kurdî (PYNK) ava kirin, Encûmena Niştimanî ya Kurdên Sûriyeyê (ENKS), jî bi hin hêzên kurd, ereb û suyanî re Eniya Aştî û Azadiyê ava kir. Ji bo avakirina eniyê, li bajarê Qamişlo yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di navbera ENKS, Rêxistina Asûrî ya Demokratîk, Teyar El Xed (Şepêla Pêşerojê ya Sûrî Encûmena Erebî li Cizîr û Ferêt ) pêk hat.

Der barê avakirina eniyê de daxuyaniyeke hevpar hat dayîn û hat gotin ku armanca eniyê avakirina Sûriyeke demokratik û nenavendî ye û ev tişt hat parvekirin: "Eniya Aştî û Azadiyê kar ji bo avakirina bingeha destûra bingehîn a nû ji Sûriyeyê re dike û taybetmendiyên hemû pêkhateyên Sûriyeyê û mafên wan ên demokratîk li ber çav digire, bi armanca gihîştina bi dewletekê ku tê de mafên welatiyan, azadî, dadperwerî û wekhevî parastî be û baweriyê bi perensîba (Sûriye welatê hemûyan e û cihê hemûyan lê heye) dike."

Di berdewama daxuyaniyê de jî ev tişt hat gotin: "Eniya Aştî û Azadiyê piştevaniyê li çareseriya siyasî li Sûriyeyê li gor biryarên navdewletî û bi taybetî biryara Encûmena Asayişa Navdewletî 2254 û daxuyaniya Cenêv 1 dike, ji bo daxwaza gel a veguherîna demokratîk, bo sîstemekê ku rêzê li mafên mirovan digire, serweriya yasayê û bikaranîna desthilatê bi awayekî aştiyane teqez dike û yekparebûna xaka Sûriyê diparêze." *QAMIŞLO*

## Li dijî qeyûman operasyona gendeliyê

Li bakurê Kurdistanê li dijî rêveberiya qeyûman cara yekemîn di nav hefteyê de operasyon hat lidarxistin. Ji ber nelirêtiyên ku ji aliyê rêveberiya Qeyûmê Mustafa Yaman ve hatibûn kirin, di nav hefteyê de Serdozgeriya Komarê ya Mêrdînê li dijî Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê operasyona gendeliyê da destpêkirin. Di çarçoveya operasyonê de 10 rêveberên payebilind ên tev li gelek bertîlxwarin û nelirêtiyê bûne hatine binçavkirin.

Mutehît û Midûrê Bajar ê DEDAŞ'ê Mehmet Bulut jî di operasyonê de hatin binçavkirin. Kesên hatin binçavkirin beriya niha li gel ku bi belgeyan nelirêtiya wan hatibû tespîtkirin jî ji kar nehatibûn avêtin û hatibûn parastin. Kesên hatine binçavkirin bi "Nelirêtî, bê usulî, zerar daye malê cemaweriyê, ruşwet hwd" tên sûcdarkirin. Di çarçoveya lêpirsînê de der barê navên cuda de jî serlêdana sûc hatin kirin. Tê gotin ku der barê van kesên li wan gilî hatiye kirin dê kar û barê nû bê kirin.

**Hatin girtin**

Ji burokratên hatin binçavkirin Midurê Kent A.Ş. û Midûrê Dicle Elektrik Dağıtım A.Ş. (DEDAŞ) yê Mêrdînê Mehmet Bulut, Karmendê Protokola Walîtiyê û Şaredariyê Bulent Erdolu, Serokê Daîreya Rêyên Çoltarê Sinan Yildirim, berpirsiyarê karê şaredariyê Mehmet Derviş Duzgoren, Şeyhmus Demir û Ahmet Akçay hatin girtin û şandin girtîgehê. *MÊRDÎN*



## LI HEMBERÎ SÊGOŞEYA BAVSALARÎ, NETEWE-DEWLET Û KAPÎTALÎZMÊ

# Jineolojî zanista xwegihandina heqîqetê ye

→ Bêrîvan Kayi

Cewhera felsefeya ku jineolojî pala xwe didê ev e 'me li ku derê winda kiriye, em li wir lê digerin'. Lê di serî de me pirsyar kir ku 'me çi wenda kiriye ku di cîhana me de evqas tije dagirkerî, şer, tundî, koçberî, birçîbûn, xerabûna xwezayê û hwd... heye. Em di lêgerîna heqîqetê de gihiştin hin rastiyan

## Necîbe Qeredaxî kî ye?



Necîbe Qeredaxî li Bexdayê Zanîngeha Mustensirye beşa Kîmyayê qedandiye. Di sala 1997'an de hem li başûrê Kurdistanê di rojnameya Jiyana Azad û piştre jî li Belçîkayê di tv û radiyoyan de xebitiye. Bi tevahî 18 sal karê rojnamegeriyê kiriye. Niha endama Komîteya Jineolojiyê ya li Ewropayê ye.

*Em di hevpeyvîna xwe ya vê hafteyê de, bi endama Komîteya Jineolojiyê ya Ewropayê Necîbe Qeredaxî re li ser jineolojiyê diaxivin.*

***Wekî têgeh jineolojî çi ye û hewceye çawa were pênasekirin?***

Jineolojî zanisteke civakî ye. Wateya wê zanista jinê ye. Bêguman jinê ne tenê weke hebûneke biyolojî, weke hebûneke civakî, siyasî , çandî ku hemû zindîtiya gerdûnê di xwe de dihewîne dibîne lê di zanistên heyî de weke mijara zanistê nehatiye dîtin. Jineolojî cara yekemîn di pirtûka parêznameya 'Sosyolojiya Azadiyê' ya Rêber Abdullah Ocalan de hat pêşniyarkirin. Jin di gelek zimanên din de jî peyveke nêzî jiyan û afirandinê ye û peyveke tenê cînsekê yan jî rêgezekê îfade nake lê girêdana jin, xweza, civak û jiyanê îfade dike. Ji bo wê jineolojî zanisteke civakî ye û hemû wateyan di xwe de dihewîne. Di wergerên materyalên nivîskî û hemû belgeyan de ku di nav 8 salên dawî de hatine amadekirin, êdî jineolojî di hemû zimanên din de jî hatiye qebûlkirin û peyva jin êdî bi wateya xwe ya rastîn tê nasîn. Ji bo wê jî em dikarin bêjin ku jineolojî zanista jinê ye, zanista jiyanê ye, zanista civakê ye, zanista hevjiyana azad, zanista xweparastinê ye.

***Gelo çi pêdevî bi pêşxistina jineolojiyê heye, dê bandora vê zanistê li ser civakê çi be?***

Jineolojî ne tenê guhertina zîhniyeta li ser koletiya jinê hatiye avakirin, ji bo bidestxistina hêza wateya jiyanê ye. Ji ber ku mirovahî bi kolekirin û dagikirina aqil, hest û zayenda jinê wateya jiyanê wenda kiriye û bi avabûna zîhniyeta bavsalar hemû têkiliyên civakê li ser bingeha hêzê hatine avakirin. Ev hem di asta mîkro û hem di asta makro de bandoreke bingehîn kiriye û mirovahî bi hezaran sal in xistiye nav şerekî berdewam. Jineolojî lêkolîna koletiya ku bi dagirkirina aqil, hest û zayenda jinê derketiye holê dike. Hûr û kûr dikole û aşkera dike. Ji ber ku herî zêde bi avakirina nasnameyeke çêkirî mêr xwezaya jinê berovajî kiriye. Nax, xislet û nasnamyên cuda li jinê hatine barkirin û rastiya jinê hatiye reşkirin. Jineolojî ronahî dixe ser vê dîroka nivîskî û rastiyên hatine berovajîkirin, aşkera dike û yên nehatine nivîsandin lêkolîn dike û dinivîse. Dema em qala dîrokê dikin ne tenê weke têgeheke raborî û mirî lê weke têgeheke zindî û herikbar dikin. Jineolojî bi lêkolîna li ser dîroka koletî û nivîsandina dîroka berxwedana jinê dê xwe bigihîne heqîqetê. Ji bo wê jî jineolojî zanista xwegehandina heqîqetê ye.

***Îro xebatên li ser zanista jineolojiyê tên kirin çi ne û niha di çi astê de ne?***

Xebatên jineolojiyê li qadeke berfireh tên kirin; hem li hemû beşên Kurdistanê û herêmê, hem li qada navneteweyî. Xebat di qonaxa yekemîn de hema hema em dikarin bêjin ku nêzî 8 sal in didomin. Mirov dikare bêje li gorî qadan giranî daye ser mijarên lêkolîn û nîqaşan; bi watayeke din çarçoveyeke kilêşeyî



nîne ku li her derê û her beşeke civakê heman tiştî bike. Mînak; rêbaznasî – metodolojî, yek ji mijarên herî sereke ye ku bi şêwazên cuda li her derê tîne ziman. Li hin cihan giranî dide ser şîroveyên bandora ol, felsefe û mîtolojiyê; li hin cihên din jî giranî dide ser felsefe, aborî û hevjiyana azad lê bêguman tiştên bingehîn hene ji bo nasandina jineolojiyê ku em wan bi astên cuda tîm tînin ziman. Qadên em berê xwe ji bo nasandina jineolojî û lêkolînan didin wan, hem qadên rasterast ên civakê ne û hem jî tevgerên jinan, tevgerên civakî û femînîst û ekolojiyê û hwd... aliyekî din jî qada akademiyê ye. Jineolojiyê li van qadan lêkolîn kirine û dike.

***Zanisteke mîna jineolojiyê, çima di nav kurdan de her wiha li Rojhilata Navîn dest pê kir?***

Pirseke pir xweş e û watedar e. Cewhera felsefeya ku jineolojî pala xwe didê ev e 'me li ku derê wenda kiribe, em li wir lê digerin' lê di serî de me pirsyar kir, 'me çi wenda kiriye ku di cîhana me de ewqasî tije dagirkerî, şer, tundî, koçberî, birçîbûn, xerabûna xwezayê û hwd... heye.' Em di lêgerîna heqîqetê de gihiştin hin rastiyan ku me civakbûnê, wateya rastîn a azadî û jiyanê wenda kiriye û di encama ve wendakirinê de hemû cureyên desthilatdariyê qat bi qat hatine avakirin. Van qatan jî bi rêbazên hem tund û hem jî nerm, bi zimanên mîtolojî, olî hatiye avakirin û bi felsefe û zanistê jî hatiye rewakirin. Çavkaniya yekemîn jî Mezopotamya ye, ji bo wê jî divê em li wê derê lê bigerin. Me di vê lêgerînê de zanist û felsefe xist bin lêpirsînê, ji ber ku diviyabû hemû çewtî, derew û qurnaziyên bi rêbazên metolojî û olî hatine kirin aşkera kiriba. Ji bo wê jî me di hemû kampên jineolojiyê de, nîqaşên xwe li ser esthilatdariyê kir ku li ser beden, ruh, aqil, zayenda jinê hatiye avakirin. Weke din jî têkoşîna 42 salan a tevgera azadiyê ku tevgera jinê cewhera vê têkoşînê pêk tîne, yek ji çavkaniya esasî ya jineolojiyê ye.

***Li tevahiya Kurdistanê xebatên jineolojiyê di çi astê de ne?***

Li hemû beşên Kurdistanê jineolojî xebatên cuda û di astên cuda de bi rê ve dibe. Bêguman xebatên herî sazbûyî û nîqaşên kûr li rojavayê Kurdistanê ne. Di asta akademiyê de xwe ava kiriye, lêkolînên sosyolojî kirine, dewrêyên perwerdeyê vekirine, bingeha fakulteya jineolojiyê ava kiriye û hwd. Li hemû beşên Kurdistanê jineolojî beşeke esasî ye. Li bakurê Kurdistanê kovareke jineolojiyê ya demsalî heye ku heya niha li ser mijarên cuda 15 berg derketiye. Li rojhilatê Kurdistanê komeke ji bo analîza sosyolojiyê hat avakirin da ku bi perspektîfa jineolojiyê lêkolînan bike. Li başûrê Kurdistanê jî xebata jineolojiyê di asta nîqaşan de her diçe berfireh dibe. Ne tenê ji bo jinan, ji bo mêran jî li ser têgînên cuda dewreyên perwerdeyê vebûn.

***Aktîvîstên femînîst ê cîhanê ji bilî nêzîkatiyên oryantalîst, gelo îro bi jineolojiyê re çiqas eleqedar in?***

Qadên me yên hevpar pir in ku em li ser wan biponijin û me bigihînin hev lê rexneyên jineolojiyê ji bo femînîzmê hene. Bi qasî jineolojî xwe bi tevger û kesayetî da nasandin lê ewqas jî bi zelalî rexneyên xwe ji bo femînîzmê, rewtên cuda yên femînîzmê, parçebûna wan, ketina nava xefika desthilatdariyê, pergala neo-lîberalîzm û xwequtkirina ji civakê û xwesînokirina bi qadên teorî û akademiyê jî kirin. Mirov rastiyekê bêje dê gelek bi feyde be; piranî tevgerên femînîst û heta nivîskar û teorîsyen û akademisyenên femînîst rexneyên jineolojiyê red nekirine berovajî weke hêz û nûbûnekê ji xwe re dibînin. Ew jî dihêle ku jineolojî di têkoşîna li hemberî sêgoşeya bavsalarî, netewe-dewlet û kapîtalîzmê de bibe zanista xwenûkirina femînîzmê.

***Jineolojî çiqas dikare pêşiya qirkirinên li ser jinan bigire û hişmendiyekê li hember çewisandin û tunehesibandinê ava bike?***

Jineolojî bi rastiya 'zanisteke ku li dora jinê were pêşxistin dê ji bo sosyolojiyeke rasteqîn bibe gavek' derket rê û ji bo ji nû ve rastî û wateya jiyanê bi dest bixe, hişmendiyê biguherîne, çiqas maskeyên bavsalar biçirîne, ewqas jî qadên têkoşînê vedibin lê bi misogerî, jineolojî di gava yekemîn de bi xebata ronîkirina rastiya jinê dest pê kiriye. Jinan bi guherîn û veguherînê, xwe bi rêxistin kir, qadên xweser ava kirin, bi pêşxistina mekanîzmayên xweparastinê ji alî teorî û pratîk de, di hemû qadên jiyanê de xwe serwextkirin û bi perspektîfa jineolojiyê dikarin pêşî li qirkirinê bigirin. Bala xwe bidê, di van salên dawî de hêzên hegemonîk ên navneteweyî û bavsalar herî zêde êrîşê dibin ser jinên birêxistinkirî. Ji ber ku ev jinên pêşeng ji bo azadiya civakê mînak in. Pêşîlêgirtina qirkirina jinan girêdayî asta rêxistinbûna jinê ye. Jineke asta serwextbûna li ser hebûna xwe, pêşxistina zanebûna xwe di hemû aliyan de bizanibe çawa bijî û çi dixwaze, ne mumkun e bikeve xefika tu hêzeke serdest.

***Em dikarin bêjin ku materyal û dokûmanên jineolojiyê –li gorî îdeayeke zanistî- gelek kêm in. Ji bo vê yekê hewce ye çi werin kirin?***

Hûn rastî bixwazin, materyalên jineolojiyê ji bo perwerdeyê ne kêm in. Weke destpêk hûn dizanin ku niha hem daxwazî pir in û hem mijarên cuda yên qadên jineolojiyê jî li gorî herêman hewceyî hene. Ji ber ku weke min got, jineolojî di qadeke fireh de xebatên xwe dike. Bi hin zimanan gelek materyal hene û bi hin zimanên din jî kêm in lê divê em jineolojiyê, ruhê vê zanistê tenê di materyalên nivîskî de nebînin. Rast e ev materyal girîng in lê divê em materyalên nenivîskî bi taybet ji kesên bi ezmûn û dapîran, kesên li gundan dijîn û di stranên gelêrî, çîrok û destanan de, di sembolên ku her malekê de hene weke materyalan bibînin. Marija Gimbutas femînîst û nivîskara lituanî bi salan dûrî welatê xwe ma lê dema xwest xwe bigihîne rastiya jinê 2 hezar stranên jinan li gundên derdora gundê xwe kom kirin. Bi vî awayî karî rastiya veşartî ya civakê derxe holê. Ev rêbaz ji bo jineolojiyê jî heman tişt e. Tevgera azadiya jina kurd li kokê li rastiyan geriya û kir çavkaniya esasî ya materyalên perwerdeyê û li ser bingeha 'ŞÎROVEKIRIN'ê ji nû ve li dîrokê nêrî. Her çawa ku Hêlîn Dêrsim bi lêkolîna xwe ya dîrokî li ser rastiya peyvên ku li herêma Dêrsimê û hin herêmên çiyayî ji bo mêr dihatin bikaranîn derxistine holê. Ev daneyên girîng û hêja yên pêşiya me ronî dikin, roj bi roj zêde bibin.

***Ji bo pêşerojê, dê jineolojî xwe çawa bihêztir bike?***

Jineolojî qadeke xweser e; zanisteke civakî ye, loma jî wê li gor vê rastiyê tev bigire. Em li hemberî nêrîna ku dibêje 'zanist hêz e' derketin. Ji ber ku tiştên jinê bi hezar salan kirine û gotine weke zanist nehatine dîtin lê em dibêjin zanist şîrovekirina wateyê, potansiyela heqîqetê ye û ev potansiyel jî di jinan de hatiye tepisandin. Jineolojî zanista derxistina vê potansiyelê ye. Wê li ser bingeha ezmûnên berxwedana jinan, ezmûnên zanista erênî ya dûrî desthiladariyê û bi rêbaza şîroveyê dixwazin potansiyela heqîqetê derxin holê û li ser wê jî derî li ser nîqaşên fireh di nav jinan û civakê bi giştî veke.

Divê were gotin ku jin bi qadeke fireh a navneteweyî bi rêya jineolojiyê ji ezmûnên têkoşîna azadiya jinên kurd, têgîn û teorî, rêxistinên xweser serwext bûn. Ev jî ji bo jinan û civakê enerjî û hêzeke mezin a xwebirêxistinkirinê ye. Weke din jî jineolojî mîna hawzeke hevpar a ezmûn û zanînên jinan e; jê sûd werdigirin û xwe ji nû ve ava dikin.

# Çandnasî û Kurdolojî



Samî Hêzil

Çandnasî wek qadeke xebatên înter-dîsîplîner piştî salên 1970'yan û bi şêlûbûna sînorên navbera qadên cîyawaz ên zanistî ket rojeva akademîk. Çandnasî îro xwedî bergeheke fireh e û ji xebatên etnîk bigire ta têkiliya çînên civakî, ji nasnameya neteweyî bigire ta têkiliya nifşan û zayandan xitabî qadeke pir fireh dike. Ji hêla teorî û nêzîkbûna fikrî ve jî bi têra xwe rewşeke cihêreng heye. Nêzîkbûnên ji qada semîyotîkê, teoriya marksîzm û femînîzmê, teoriyên wêjeyî, werger, polîtîka û felsefe, an ku çendîn behrên hişmendiyê hebin di duriyana çandnasiyê de rastî hev tên.

Di roja îro de, civak û çand di nav anaforeke guherînan de digevizin, her ku teorî û nêzîkbûnên cuda hewl didin wan guherînan li gor xwe pênase bikin. Bi tespîta Kellner, salên 1960'an wir ve dinya bû qada "şerên çandî" yên navbera lîberal, parêzkar û radîkalan ku her yekê ji wan hewl dida çand û civakê li gor rojevên xwe ji nû ve saz bike. Çawa ku li Ewropa û Amerîkayê çandnasî bû sehneya dijberiya lîberal û parêzkaran, li welatên Asya, Afrîka û Rojhilata Navîn jî bêtir bi têgehên dijkolonyal terîf hatin kirin. Kurd jî tê de, ji bo gelên bindest û bêstatu derfetên nû yên ji bo zemîneke teorîk derketin holê. Ew zemîn jî bi trendên mafê mirovan, azadiyên sivîl, aştî û edaletê diafire û ji xwe re hincetên çalak ên xebatê derdixe holê.

Bingeha Kurdolojiyê jî her wekî xebatên zanistî yên der barê piraniya gelên rojhilat, bi destê rojhilatnasên ewropî û rûs ve hatiye avakirin. Bi sedsala 19'an re, an ku heyama zêrîn a oryantalîzmê, sefera lêkolîner, zanyar û gerokên ewropî ya ber bi Kurdistanê ve dest pê kir. Her çiqas ji welatên cihê ên Ewropayê û ji Rûsyayê hatibin jî kurdnasên ewropî û rûs di nêzîkbûn û metodên xwe de hema wekî hev bûn. Edward Said binê vê hevpariya oryantalîzma alman, anglo-fransî û piştre jî ya amerîkî xêz dike û vê hevpariyê jî wek desthilatdariya entelektuelî ya rojava ya li ser rojhilat bi nav dike.




Balkêş e ku di xebatên kurdnasên ewropî de, bi taybetî jî di berhevkariyên dîrokî û siyasî de, dijderketina kurdan a li hember dagirkeran û hêzên derveyî cih nagire. Ew nayê wê wateyê ku kurd li hember mudaxaleyên derve bêyî helwest mane û di heyamên girîng de serî ranekirine lê xuya ye ku mîsyonên polîtîk, têkiliyên bi dewletên mezin, û acizî û astengiyên desthilatdarên herêmî rêya wê sansurê vekiriye.

Helwesta rojhilatnasan a ber bi wêjeya devkî ya kurdî mînakeke berbiçav a desthilatdariya entelektuelî ye. Lêkolîner û berhevkarên ewropî reng e ku bi çaveke lawaz li berhemên devkî nihêrîne û ew netemambûyî nirxandine; lewma bi lêkdana vegotinên devkî hewl dane tekstên têkûz ên nivîskî biafirînin, bêyî ku girîngiyê bidin şexsîbûn û zengîniya vegotina dengbêj û çîrokbêjan. Her wiha wan kesên navborî di senifandin û binavkirina berhemên kurdî de, bêyî ku qîma xwe bi reseniya tekstan bi xwe bînin, li gor pîvan û kategoriyên xwe pênaseya berhemên kurdî dane û bi vî awayî jî bûne bayîsê aloziyeke termînolojîk.

Îro, bi gelemperî nîqaşên der barê Kurdolojiyê de dikarin bi sê koman bên dabeşkirin:Yek; dîroka nêzikî du sed salî ya xebatên Kurdolojiyê û gencîneya berhevkariyê ya ku li hin navendan û bi rêbaz, ziman û elfabeyên cuda hatine tomarkirin û şîroveyên der barê wan. Du; hebûn û nebûna sazî û dezgehên akademîk û zanistî, tecrûbeya heyî û kemasiya wan a teorîk û pratîk. Sê; nêzikbûneke nûjen, helwest û tercîhên teorîk û pîlansaziyeke objektîf û demdirêj.

Her çiçiqas yekem–an ku gencîneya berhevkirî–ye; xebatên arşîvê, tîpguhezî, wergêr û ji nû ve katalogkirin ev peywir in ku li holê disekinin. Ji bilî wan jî ger ku li pey şopa nêzîkbûna oryantalîst û kurdnasên desteya yekem rêçbirin û rexneyeke nû pêk were, hingê dibe ku alozî û neheqiya bi xweseriya metnên kurdî hatine kirin ji holê rabe. Divê bê gotin ku rojhilatnasên ewropî bi berhevkariyên xwe yên hêja çiqas spasiyê heq bikin jî bi senifandin, hewldanên tekûzkirin û tekst-afirandinên bi pêşdarazî ewqas jî rexneyan heq dikin.

Belkû di xebatên Kurdolojiyê de tengejeya herî mezin di warê saziyên zanistî û akademîk de xwe dide nîşan. Bêstatubûna kurdan, tunebûna piştevaniya aborî û sînorên zaravayî, elfabeyî û her wiha siyasî nehişt ku kurd bibin xwedî ekolên xwe yên zanistî û akademîk. Li hin paytextên ewropî û bajarên wek Şam, Stenbol, Êrîvanê û di pey re jî bi beşên Ziman û Wêjeya Kurdî ên zanîngehên Mêrdîn, Bîngol û yên din sînerjiyeke akademîk û zanistî bi xwe re çêkir ku reng e ku li pêşerojê encamên wan baştir bên şîrovekirin.

Kurdolojiyeke ku bi pîvanên çandnasiyê dor û berên wê bên kifşkirin dê ji bo terîfa nasnameya kurd jî çarçoveyeke bikêr diyar bike. Tişteke bi têra xwe aşkera ye ku êdî ne pêkan e ku bi terîfên demode qala nasnameyekê bê kirin. Terîfa neteweper(est) wisa xuya ye ku bi têgehên xwe yên qerimî û bi çarçoveya xwe ya teng nikare bibe bersiva aîdbûnên têkilhev ên roja îro. Çandnasiyeke ku bi rêya teoriyeke kûr û bi nêzikbûnên piralî Kurdolojiyê terîf bike, di heman demê de dê pênaseyên nû dabîn bike ji bo qrîzên terîfa nasnameyê jî.

Di xebatên Kurdolojiyê de berî her tiştî zelalbûneke teorîk û sekneke zanistî pêwîst e. Ji bo kifşkirina çarçoveya teorîk jî pêwîstî bi xebatên li ser nîqaşên teorîk ên parzemîna Ewropayê heye. Dîroka du sed salî ya Kurdolojiyê bi qencî û xirabiyên xwe hêjayî lêkolînên cihê ye; ancax bi lêkolînên bi vî rengî bergehek ji bo pêşerojê dikare bê kifşkirin. Îro derfet çêbûne ku zanyar û akademîsyenên kurd, bêyî kompleks û xwebiçûkdîtinê, hesabê xwe yê bi oryantalîstan bigirin û hewl bidin da ku terîfeke nû ya çandî û nasnameyî çêbikin.

# Ferman an jî çirûskek hêvî

Mem Farqînî

Bi rastî li ser vê axa qedîm heta niha gelek gel û bawerî hatin û çûne lê belê yek ji van gelên qedîm li hember her cure zilmê li ber xwe da û heta roja me hebûna xwe domand. Her çiqas di roja me de di nav gelên heremê de hin cudahî, di aliyê baweriyek de hin taybetmendî hebin jî di cewhera xwe de tev yek in. Ji yek çavkaniyê bingeha xwe digirin.

Di vî alî de mînaka herî biçûk dikarim li ser gelê kurd bidim. Bi hêsanî dikarim bibêjim ku tav û agir di nav hemû kurdan de pîroz in. Tu dixwazî bila misliman bin, dixwazî bila qizilbaş, ehlê heq an jî yarsanî bin, bi awayekî li malên tevan yek ji perr û baskên melekê tawis heye. Dibe ku vêya ji alî hin kesan biçûk bê dîtin lê di aliyê  netewebûnê de, di hestên civakî de ew jî gavek e.

Carna hin tişt hene ji nişka ve diqewimin û li pey xwe êşeke mezin dihêlin. Lê di rastiya xwe de ev êş  jî dibin ûjdan ji bo ku mirov xwe nas bike. Mirov dema xwe bi vana ve girê bide dikare di nav xwe de hestên netewebûnê biafirîne.

Ev gotin ji bo min çiqas zehmet be jî ez li vir qala çeteyên  DAIŞ'ê û êrîşên wan ên li ser  gelê kurd dikim. Heta niha jixwe li ser wan çeteyên hov û armanca wan gelek tişt hatin gotin û hatin nivîsandin. Kêm zêde bi hemû nirxandinan re me. Lê ez ê ji aliyekî din ve van êrîşan binirxînim.

Tê zanîn ku li hember  van êrişên hovane kêm zêde gelê heremê tev êş kişand lê ev rastî jî heye ku di  nav gelê heremê de tu gel wek kurdan ne li ber xwe da, ne jî  êş kişandin. Her çiqas lîstikên pir qirêj li ser gelê me hatibin lîstin jî mirov pir hêsan dikare du sebeban derxe pêş.

Yekemîn tişt ev bû ku  piştî şoreşa Bihara Ereban gelê kurd  jî bi vê bêhna xweş, bi bêhna azadiyê cegerên xwe tije kirin û xwestin xwe bi rê ve bibin. Helbet dewletên  heremê li hember vêya bertekên tund nîşan dan û ji bo armancên xwe yên veşarî û lîstikên kirêt têxin meryetê ev wek firsend dîtin.

A duyemîn jî di aliyê bawerî û olê de xwe nîşan da. Di nav kurdan de her çiqas hejmarek pir zêde mislimanên sunî hebin jî, hinek ji wan qizilbaş, yarsanî, kakaî ehlê heq, fileh û hinek jî ji wan êzdî bûn û qetilkirina vana helal bû. Jixwe heta niha ji bo baweriya xwe heftê û du caran fermana hatibû rakirin. Ma kê wê ji bo van  " kafiran " xwe bida kuştin. Ma wê kê xwe bigihandina hewara wan. Lewre wan carekê baweriya xwe bi melekê Tawis anîbû!

Dema çeteyên DAIŞ'ê êrşî Şengala pîroz kir, ji demsalan havîn bû. Li esmanê Şerefdîn û Çilmeran stêrk diçirisîn lê her tişt ji nişka ve serobino bû. Ewrên reş stêrka nuxumand. Kelegerma havînê têr nedikir, di vê nîvê şevê de ji dêvla hewaya hênik guleyên ji çekên çeteyên DAIŞ'ê derdiketin xwîna wan dirijand ser axa pîroz. Carekr din ev axa pîroz wê bi xwîna sor bihata şûştin.

Di demeke pir kin de qirkirin dest pê kir. Û hema hema  wê îcar bigihişta armanca xwe jî. Lewre di demeke pir kin de bi sedan mêr û xortên êzidî hatibûn kuştin. Bi hezaran jin û keçikên êzidî hatibûn revandin. Çeteyan hinek ji wana kiribûn 'jinên xwe' û hinek ji wana jî şandibûn bazarên hin paytextên welatên cîranan ku bifroşin

Di aliyê derûnî de birînek bê derman vebûbû. Di ser vana de nezanî, xizanî, têkçûyîn, reva ji mirinê… Li gorî êrîşkeran her tişt qediyabû! Helbet ji bo êzidiyan jî. Lewre heta niha di dîroka vî gelî de tu kes tu kurdek nehatibû hawara wan; ta wê rojê. Ta ku heft pêlavsor derdiketin ser dikê. Dîroka xiyanetê, xizaniyê, têkçûyîn û neçariyê serobino kir.

Xwedê giravî dema min pênûsê girt destê xwe, dilê min hebû ku li ser pirtûka "Şengal Vejîna Çilmêran" çend tiştan binivîsim. Min xwendinê qedandibû û bi wê kelegermê min ê li ser pirtûkê nêrînên xwe bianiya ziman lê belê her çiqas dilê min vê bixwaze jî, pênûsa min ez ber bi aliyek din ve birim. Nehişt ez ji we re behsa xweşikbûna Êzidxanê û çiyayên Şefredînê bikim. Nehişt ez behsa xwedêda, xezal, tijda û yên din bikim. Nehişt ez qala berxwedanê û îxanetê bikim.




Hibra pênûsa min wek avê di nav cihoka xwe de herikand. Dest û piyên min girê dan. Nasîna vana ez ji we re dihêlim. Hûn bi xwe vê pirtûkê bixwûnin û fêr bibin di demeke pir kin de her tişt çawa li bin guhê hev dikeve, serobino dibe. Hîn bibin bê ka meseleya Xanesor û Çilmêran çi ye?

Pirtûk ji aliyê Azad Ararat ve hatiye sivîsandin û ji weşanxaneya Aryanê ve gihişt ber destê xwendekaran. Ji aliyê ziman de herikbar e. Mirov ne tenê di alî êrîşan de, di aliyê baweriyan de jî gelek  tiştan hîn dibe.

Bixwînin, bidin xwendin û bibînin ka çawa ew kurdên tu car nehatine ba hev, li ber tîrêjên rojê xwe diafirînin…



## Zarok lîstikên xwe bi xeyalên xwe dixemilînin

Çavreş Zamanî

Dema zarok tê gotin, tişta ku destpêkê tê bîra mirov lîstik û paqijiya dil e. Haya zarokan ji pergala kapîtalîst tune ye û di nav wê de qirêjî nebûne; ji ber vê jî ew bedewiya jiyanê bixwe ne.

Ji bo zarokan tişta herî xweş lîstina bi hevalên xwe yên zarok re ye; ew ji sibê heta êvarê dikarin bi hev re bilîzin. Derengiya şevê, heta bikevin hembêza dayika xwe û xwe şîrîn bikin jî li lîstikê wê dotira rojê bilîzin û teşqeleyên bikin difikirin.

Zarok pêşeroja civakê ne. Ên zarokan perwerde dikin jî dayik û bav in. Zarok destpêkê di malbatê de fêrî hezkirin, ehlaq, çand û hwd. dibin û ew di kesayeta wan de bi cih dibin. Li gor rewşa zanebûn, menewiyat û madiyata malbatê, kesayeta zarokan teşe digire. Her wiha bawerî û ednîgarî jî bandorê li zarokan dike ku ev yek bi taybetî ji bo zarokên Şengalê wisa ye.

Kesên şahidiyê li Fermana 3'yê Tebaxê kirine, çi bi çavên xwe çi jî bi rêya ragihandinê, dîtine ku zarokên Şengalê çawa bê av û xwarin man û ji ber germ û tirsê canê xwe ji dest dane. Zarokên dema fermanê li ber pêsîra dayika xwe bûn, tevî ku 6 sal derbas bûne jî li Şengalê hîn jî li bin konan dijîn. Her çiqas pir zehmet be jî, ew li ser axa xwe dijîn ku ev tiştekî gelek bi wate ye. Yên li bin van konan bi şox û şengiya xwe dijîn, dîsa zarokên rûliken in. Germa rojê qet ne xema wan e û ew li ser erda sincirî bi hev re bi awayekî pêxwas dilîzin. Yek ji van zarokan zaroka bi navê Hejar e ku di nav konên çiyayê Serdeşt û germa Şengalê de, bê tirs bi kevkaniya xwe digere. Hejar zarokeke deh salî ye. Wê pêşî bi kenê xwe yê şermok li min mêze kir, paşê vegeriya çû cem koma hevalên xwe yên zarok. Lê dema min wêneyê wan girt, kêfxweş bû û nêzî min bû. Hejarê navê hemû hevalên xwe ji min re rêz kir…

Min jê pirsî, 'ew çi ye di destê te de?' Hejarê kevkaniya xwe nîşanî min da û bi kêfxweşiyeke mezin got, 'ev kevanok e, min ev kevanok hîn nû çêkiriye.' Bi kêfxweşiya wê, ez jî gelek kêfxweş bûm; ev kevkaniya wê ya yekem e ku ji xwe re çêkiriye û min şahidiya kêfxweşiya wê kir.

Wek hemû zarokên Kurdistanê, me jî kevakanî çêdikirin. Tu caran ji bîr nakim. Dema em zarokên gund, me bi kevkaniyên xwe nîşan digirt, kevir çûbû tam li nav eniya zilamekî ketibû. Zilam xerbîlî bûbû û her kes li dora wî kom bûbû. Min ji Hejarê re got, 'mêzeke ev kevkaniya te gelek xweşik e, pê bilîze lê tu caran canê kesê neêşîne.' Strana Aram Tîgran ya dibêje 'xweziya dîsa zar bûma' tê bîra mirov, dema mirov kenên vê koma zarokan dibîne.

Di vê sedsala 21'emîn de, ruxmî teknolojî evqas bi pêş ketiye jî, zarok di şert û mercên kêm de, ji bo jiyana xwe bi lîstikan bixemilînin her tiştî dikin; bi afirînerî û xeyalên xwe lîstokan çêdikin. Li seranserê Kurdistanê êrîş hene û ev êrîş herî zêde li zarokan tên kirin. Desthilatdarên zilam zarokan dikujin, tecawizî wan dikin û wan dixin zindanan. Ji bo zarokên welatê me dikaribin bi awayekî azad bi lîstokên xwe bilîzin û siberoja xwe bixemilînin divê em li dijî vê zilmê bêdeng nemînin.

# Çavên dayikên Şengalê hîn jî bi rondik in

**Piştî êrîşa hovane ya çeteyên DAIŞ'ê ya li ser Şengalê di 3'yê Tebaxa 2014'an de gelek trajediyên din li dîrok û çîroka gelê êzidî zêde bûn û hê jî aqûbeta gelek kesan ne diyar e**

Navenda Nûçeyan

Di hemû şer û pevçûnan de herî zêde jin û zarok tên mexdûrkirin. Nexasim ku ew êrîş ji alî çeteyên hov ên wekî DAIŞ'ê ve bên kirin, ew mexdûriyet û tedeyî digihêje lûtkeya herî jor. Tevî ku 6 sal bi ser komkujiya Şengalê re derbas bûne, hê jî bi hezaran êş û birînên ku bi xwe re anînbûn nehatine dermankirin. Fermana 73'yan a li ser Şengalê, rûpelek din a tawan û komkujiyan e di dîroka gelê kurd de ku li ser kurdên êzidî pêk hat. Tu mal û kesek li Şengalê nîne ku bi dehan çîrokên wan ên trajedî tune bin. Yên di dema fermana 3'yê Tebaxa 2014'an de li Şengalê bûn wê tu caran wê rojê ji bîr nekin. Şeş sal bi ser fermanê re derbas bûn lê hîn jî çavên dayikên Şengalê bi rondik in û li benda zarokên xwe yên aqûbeta wan ne diyar in.

Çeteyên DAIŞ'ê di şeva 2 ya li ser 3'yê Tebaxa sala 2014'an de, êrîşî ser navçeya Şengalê kirin û komkujiyek mezin li ser gelê Şengalê pêk anî. Kurdên êzidî di wan rojan de Cejna Çileyê Havînê pîroz dikirin. Lê çeteyan di wê rojê de bi hezaran kes şehîd xistin û bi hezaran jin, zarok û pîr revandin û heya niha jî aqûbeta gelekan ji wan ne diyar e. Her wiha bi deh hezaran welatiyên Şengalê koçber bûn.



Edlan Hesen xelkê gundê Tilbenat yê girêdayî Şengalê ye. Dayika 6 keç û 2 kuran e, Edlan Hesen mîna bi hezaran kesên din ew jî li benda xizmên xwe yên ku ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatine revandin û aqûbeta wan ne diyar e.

Edlan Hesen di dema êrîşa çeteyan de li gel hinek kesûkarên xwe karîbûn ji Şengalê derkevin lê piştî demek kurt li yek ji bendên li nêzî Şengalê çeteyên DAIŞ'ê pêşiya wan girt û 28 kes ji malbat û xizmên wê revandin. Yek ji van kesan jî keça wê bû.

Piştre jî bi zarok û hinek kesûkarên xwe re derbasî çiyayê Şengalê dibin û 9 rojan li wir dimînin. Piştre jî beşek ji wan derbasî kampan dibin û cih û warên xwe li pişt xwe dihêlin. Beşek din jî derbasî derveyî welêt dibin.Piştî 8 mehan xeber digihê dayika Edlan ku keça wê bi pereyan ji destê çeteyan tê rizgarkirin. Piştî demekê jî çar xizmên din ên dayika Edlan tên berdan.

Niha jî 28 kesên ku ji malbata Edlan Hesen wenda ne, tenê 5 kes vegeriyane, aqûbeta yên din ne diyar e. Dayê Edlan bi dilek xemgîn behsa kesûkarên xwe kir û got: "Tenê hêviya me ji xwedê heye ku kesûkarên me sax bin û rojekê li me vegerin."

## Hevdîtinên kurdî berdewam in

Li gorî agahiyên hin çavkaniyên rayedarên Rêveberiya Xweser di demeke nêz de hevdîtinên pêla duyemîn di navbera partiyên kurdî rojavayê Kurdistanê de bi çavdêriya Amerîkayê pêk tên. Li gorî heman çavkaniyê beriya heftiyekê nûnera Amerîkayê ya Rojhilatê Firatê Zehra Bêlî, li baregeha Hêzên Hevpeymana Navneteweyî ya li Hesekê hevdîtinek bi serokê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mezlûm Abdî re kiriye. Di hevdîtinê de hatiye teqezkirin ku di demeke nêz de li ser bingeha peymana Duhokê ya 2014'an dê aliyên kurdî dîsa li hev bicivin û hevdîtinên xwe yên ji bo avakirina lêvegereke kurdî ya hevbeş berdewam bikin.

Hêjayî gotinê ye ku di meha hezîrana borî de, aliyên kurdî li ser hin xalên sereke li hev kiribûn û soza berdewamkirina hevdîtinan dabûn.

Ji aliyekî din ve Rêveberiya Xweser hin tevdîrên ji bo rêgirtina li belavbûna nexweşiya koronayê girtibûn. Di daxuyaniya rêveberiyê de hatibû gotin ku ew dê deriyên sînorên xwe yên bi Başûr re bigirin û kesên ku ji derveyî herêmên Firatê tên dê 14 rojan di karantînayê de bihêlin. Her wiha di daxuyaniyê de hatibû gotin ku ew êdî dawet û serxweşiyan jî qedexe dikin û xwarinxane jî êdî nema dikarin wek berê bixebitin û ew tenê dikarin li ser daxwazên xelkê xwarinan ji wan re bikin pakêt û bibin malan.

Wekî tê zanîn heta derdora 8 nexweşên ku korona li wan hatibû tespîtkirin hebûn û wan kesan têkilî bi derdora 100 kesî re danîbûn û ew tev niha di bin çavdêriyê de ne. *QAMIŞLO*

## Tevgera Azadî li Bexdayê hevdîtinan dike

Şandeya Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê (Tevgera Azadî) bi serokatiya Hevserokê Tevgerê Mihemed Abdullah ev çend roj in ji bo rêzehevdîtinan li Bexda ye.

Şandeya Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê (Tevgera Azadî) bi tevgerên Hîkme, Sedir û Koma Babîlonê re hevdîtin kirin. Hevdîtina yekem b Tevgera Hîkmeya Niştimanî bû. Ji aliyê beşek ji berpirs û parlamenterên Tevgera Hîkmeya Niştimanî ve bi germî hatin pêşwazîkirin.

Civîna duyemîn bi Tevgera Sedir bû. Hevdîtina sêyemîn jî b bi Koma Babîlonê ya Mesîhiyan a li Parlamentoya Iraqê re pêk hat.

Hevdîtin ji bo xurtkirina peywendiyên dostane, bi hemahengî û bi hev re ji bo çareserkirina rewşa niha ya Iraqê karkirine.

Peywendiyên di navbera Hewlêr û Bexdayê de, yek ji rojên din ên hevdîtinan bû. Tevgera Azadî destnîşan kiriye ku yekrêzî û jiyana bi hev re çareserkirina krîz û pirsgirêkên niha yên Iraqê ye.

Her wiha rewşa xerab a xelkê û geşedanên dawî yên siyasî û ewlehiyê mijareke din a hevdîtinan bû.

Li gorî Hevserokê Tevgerê Mihemed Abdullah jihevfamkirin û nêrînek hevbeş der barê beşek ji mijaran di navbera wan û Iraqê de ji bo çareserkirina pirsgirêk û krîzan hebû.

Di hevdîtinan de hêzên Iraqê kêfxweşiya xwe aniye ziman ku bi nêrînek nû û cudatir hevdîtin kirine û nêrînên xwe bi hev re parve kirine. *BEXDA*

Cejna we pîroz be!

Bi dîroka xwe ya kevnar,
Bi tevna xwe ya çandî,
Bi baweriyên xwe yên cihêreng,
Bajarê xweşbînî û nefsbiçûkiyê ye, çimkî her tim hêvî ye Amed.
Cejn, rojên me yên herî taybet in ku em di van rojan de kêfxweşiyên xwe parve dikin û bi rûkenî piştgiriyê didin hevdu.
Em di vê cejnê de jî, ji bo rojên bê yên bitendurist, li mesafeya xwe civakî baldar in û maskeyan bi kar tînin.
Bi hêviya em di cejnên bê de, bi kêfxweşî dikaribin hevdu hembêz bikin,
Cejna we ya qurbanê pîroz be.

Odeya Pîşesazî û Bazirganiyê ya Amedê

# Misir serkêşiya vê nerazîbûnê dike

## Bi armanca pêşîgirtina li destwerdanên hikûmeta tirk ên li Iraq, Sûriye û bi taybetî Lîbyayê Misir ketiye nav liv û tevgerê

Navenda Nûçeyan

Bi zêdebûna destwerdana hikûmeta tirk a li ser xaka welatên ereban ku piştî Sûriyeyê dest avêt Iraq, Lîbya û Yemenê, niha jî dest davêje Azerbeycanê. Vê yekê hişt ku nerazîbûnên li hemberî vê destwerdanê jî zêde bibin. Serkêşiya vê nerazîbûnê jî hikûmeta Misirê dike. Hikûmeta Misirê gelek caran nerazîbûna xwe ji destwerdana Tirkiyeyê ya kar û barên Sûriyeyê anî ziman û rayedarên Misirê tînin ziman ku ew dê nehêlin hikûmeta tirk rewşa Lîbayê jî bike wekî ya Sûriyeyê.

Di vê dema dawî de li ser daxwaza Misirê, hin hewldanên pêşîgirtina li vê destwerdanê derdikevin pêş û hevdîtin bi rayedarên Urdun û Iraqê re tên kirin, ji bo helwesteke hevbeş li dijî van destdirêjiyan bê nîşandan. Li gorî rojnameya Al-Ghad a Urdinê, wezîrên karên derve yên Misirê Samih Şukrî û yê Urdinê Eymen El-Sefedî aşkera kir ku dê lûtkeyek li ser asta lîderên her sê dewletan were lidarxistin û amadekarî jê re tên kirin lê dema lûtkeyê nehat aşkerakirin.

Her sê welatan li ser xurtkirina nêrîneke hevpar der barê dosyayên erebî de nîqaş kir. Ev yek bi koordîneya Misir-Urdinê ya der barê doza Filistînê de, di serî de mijara îlhaqê ya Îsraîlê de diyar bû.

Nêrînên Misir, Urdin û Iraqê yên girêdayî dosyaya Lîbyayê û girîngiya bidawîkirina destwerdana Tirkiyeyê hevpar in. Ev mijar jî di hevdîtina Behrem Salih û sefîrê Misirê li Bexdayê de aşkera bû ku roja pêncşema borî hatibû lidarxistin.



Di mehên dawî de, Iraq û Urdinê piştevaniyeke diyarker der barê helwesta Misir û Sûdanê ya girêdayî aloziya bendava Etyopiyayê de nîşan da. Li beramberî wê, Qahîre binpêkirinên domdar ên Tirkiyeyê yên li xaka Iraqê şermezar kirin û wekî karekî "şantajkirinê" bi nav kir.

Projeyên enerjî û ceyranê, her wiha desteka diyarker a Qahîre û Umanê di têkoşîna li dijî terorê de, li Iraqê û xebatên ji nû ve avakirinê, berjewendiyên aborî yên her sê welatan in.

Rojnameya Al-Ghad li ser zimanê dîplomatê berê yê Urdinê, Semîr Misrawa ragihand ku hevbendiya sêalî xaleke xurt a avakirina hevsengiyê li Rojhilata Navîn li hemberî zêdegaviyên Îran û Tirkiyeyê ye.

Di her du lûtkeyên dawîn de, her sê welatan li ser tevkariya di warê têkoşîna li dijî terorê de, girêdana bi înîsiyatîfa aştiya erebî ve ya ji bo çareserkirina doza Filistînê, girîngiya aktîfkirina rola erebî li Sûriyeyê her wiha xurtkirina tevkariya aborî, bazirganî û enerjiyê ji bo demekê li hev kir.

Di lûtkeya duyemîn de serokên her sê welatan girîngiya parastina ewlehiya herêma Kendava Erebî û misogeriya azadiya navîgasyonê, wek beşeke bingehîn a ewlehiya neteweyî ya ereban hate destnîşankirin. Her wiha li ser pêwîstiya piştevaniya bi Erebistana Siûdî re li hemberî êrîşên li dijî înşaetên wê li hev kirin. Şîrovekarê siyasî yê Iraqê got: "Texmîn dikim ku dê di lûtkeyê de helwesteke erebî ya hevpar derkeve ku xaka erebî biparêze û bihêle ku dewletên din ên erebî bibin xwedî heman helwestê."



# Piştî Lîbyayê niha dora Azerbeycanê ye

Navenda Nûçeyan

Çavkaniyên taybet diyar kirin ku dewleta tirk plan dike, çeteyên Sûriyeyê û leşkerên tirk derbasî şerê di navbera Ermenistan û Azerbeycanê de bike. Ji bo wê çeteyên li gelek herêman û Idlibê amadekariyên xwe dikin da ku biçin Azerbeycanê.

Tê diyarkirin ku piştî ragihandina wezîrê parastinê yê dewleta tirk Hulusî Akar ya piştgiriya ji bo şerê Azerbeycanê yê li dijî Ermenistanê, çeteyan dest bi amadekariyan kiriye. Li aliyê din, wezaretê piştrast kir ku serbaz û leşkerên tirk gihaştine Azerbeycanê.

Heman çavkaniyan da zanîn ku bi dehan çeteyên Sûriyeyê li beramberî 5 hezar dolarî, dê piştî cejna qurbanê biçin Azerbeycanê.

Di navbera Azerbeycan û Ermenistanê de ji salên 1990'î ve, ji bo serweriya çiyayê Qerebaxê nakokî hene. Li herêmê, hinek caran di navbera her du aliyan de şerên dijwar rû didin. Hefteya din, di şerê navbera her du dewletan de, 2 leşkerên Azerbeycanê hatin kuştin û 5 leşker jî birîndar bûn û leşkerek Ermenistanê jî hat kuştin.

Her wiha çavkanî û dezgehên çapemeniyê bi bîr xistin ku hejmara çeteyên Sûriyeyê yên dewleta tirk şandine Lîbyayê, ji 15 hezar çeteyî zêdetir e. Li gorî Mala Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) ji wan 500 çete hatin kuştin.

# Îran li Sûriyeyê nayê xwestin

Êdî ji alî her kesî ve tê zanîn ku hebûna Îranê ya li Sûriyeyê rastî nerazîbûna gelek aliyan tê. Dema mirov bala xwe bide helwesta welatên herêmî û yên cîhanî, di vê der barê de êdî bi zelalî xuya dibe ku nerazîbûneke mezin ji hebûna Îranê ya li Sûriyeyê heye. Tiştê balkêş helwesta hevalbendê wê Rûsyayê jî ji ya van dewletan ne cuda ye.

Li gorî rêxistina Mala Çavdêriyê ya Mafê Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) di demên dawî de di êrîşên li dijî komên çekdar de, yên ser bi Îranê ve ku li ser axa Sûriyeyê bi cih bûne, ji bilî xisarên madî zêdeyî 60 çekdaran hatine kuştin. Li gorî tê texmînkirin piraniya van êrîşan ji alî balafirên Îsraîlê ve hatine kirin. Li gorî heman çavkaniyê, ji gulana 2020'an vir ev zêdeyî 10 bargehên Îranê ên li Qunêtira, Humus, Hema, Dêra Zorê, Heleb û gundewarên Şamê hatine topbarankirin.

Tiştê balkêş a li vir, ew êrîş rastî nerazîbûnên hevalbendê wê Rûsyayê nehatin lê berevajî vê yekê em dibînin ku Rûsya jî ji wan êrîşan kêfxweş e û ew dixwaze ku desthilata Îranê ya li ser Sûriyeyê kêm bibe.

Bi vê yekê Rûsya dixwaze ku hêza sereke ya li Sûriyeyê xwedî gotin be ew be û ne hevalbendê wê Îran be. Lewre jî tê payîn ku di encama zextên navneteweyî yên li ser Îranê de, deshilat û bandora wê ya li Sûriyeyê were kêmkirin.

***ŞAM***



**Xweşkanî**



Felemez Ulug

# Di nav hevsengiyên heyî de hebûna kurdî

Li ser zemîna Sûriyeyê, gelek dewlet neçar in ku bi hev re di nav têkiliyan de bin. Ev tekiliyên ji ber bêîstiqrariya rewşa herêmê ya leşkerî û polîtîk tên pêşxistin, bi xwe re şert û mercên nû ava dikin. Di nav van hevsengiyan de, dewleta tirk jî dixwaze li herêmê bibe hêza sereke. Lewma ji bo li vê derê Rûsya û Îranê bê bandor bike di nav lîstikên kirêt de ye.

Em hemû dizanin ku armanca Erdogan ya sereke xurtkirina desthilatdariya xwe ye. Bi taybetî piştî hewldanên qaşo darbeya leşkerî ya 15'ê tîrmehê, deshilatdariya Erdogan li Tirkiyeyê heya radeyekê gihaşt armanca xwe. Lê bi vê pêvajoyê ve girêdayî dewleta tirk li himberî cînarê xwe polîtîkayek hîn hişktir da destpêkirin. Bi vê yekê dixwazin di warê leşkerî-polîtîk û aborî de, pozîsyona xwe xurt bikin û di herêmê de bibin hêza sereke. Ji bo di vê mijarê de bigihêjin armanca xwe, pêwîstî bi hêza leşkerî dibînin. Ji ber vê yekê, dewleta tirk heya jê tê dixwaze leşkerên xwe li herêmê bi cih bike.


Leşkerên tirk bi hincetên cuda, li Sûriye, Iraq û Lîbyayê di nav operasyonan de ne. Ji derveyî van qadan, baregehên leşkerên tirk, li bakurê Qibris û Somaliyê jî hene. Van demên dawîn, dixwazin li Nahçîvan (Azerbeycan) û Durresê (Arnavutluk) jî baregehên leşkerî ava bikin. Bi vê yekê dewleta tirk dixwaze bandorê li cînarên xwe bike.

Bêguman ev siyaseta belavbûna leşkerî ya dewleta tirk, hin hêzên mezin aciz dike. Hevsengiyên hesas ên leşkerî yên li Sûriyeyê li Lîbyayê jî hene. Lewma jî dewleta tirk ji bo li van deran bikaribe hebûna xwe xurt bike û li herêmê bibe hêzeke berbiçav, neçar e ku hin hêzan bêbandor bike. Ji ber vê yekê, di serî de Rûsya, gelek dewlet ji vê siyaseta veşarî û xapînok aciz in. Li Rûsyayê, gelek kes di mijara hevaltiya bi Tirkiyeyê re aciz in. Li gor wan, dewleta tirk ji bo Rûsyayê lawaz bike û hebûna xwe li herêmê xurt bike, bi Rûsyayê re di nav têkîliyê de ye. Dema mirov li pêşveçûn û bûyerên diqewimin mêze dike, mirov nikare bêje ev kes bi temamî şaş in. Dewleta tirk di van salên dawî de, di warê leşkerî de li bakurê Sûriyeyê, rojava û başûrê Kurdistanê û Lîbyayê gelek peymanên navneteweyî binpê kirin. Qada navneteweyî li hemberî vê neheqiya dewleta tirk, her tim bêdeng û bêhelwest ma. Di nav sînorên Tirkiyeyê de bêmafiyên di pêvajoya desthilatdariya Erdogan de pê hatin, niha derbasî derveyî sînor tên kirin. Belavbûna leşkerî û bi vê ve girêdayî, bêîstiqrariya heyî ya li herêmê, ji bo planên xwe pêk bînin şert û mercên tên xwestin ava dike. Her çiqas li hemberî vê siyasetê hin hêzên mezin aciziya xwe nîşan bidin jî, di rastiyê de ev li xweşa wan jî diçe. Ji ber ew jî baş dizanin ku ger li herêmê kaos û pevçûn nebin hebûna wan a li qadê jî bêwate ye. Lewma hefsarê dewleta tirk di destê van hêzên mezin de ye. Geh kin dikin geh jî dirêj dikin lê tu carî nahêlin ku li herêmê ji derveyî îradeya wan tiştek biqewime.

Bêguman dewleta tirk jî baş fam kiriye ku ji ber hin pêwîstiyên herêmî, ev hêzên mezin hewceyî wan in. Lewma ew jî dixwazin di vê qadê de hebûna xwe xurt bikin. Ji ber vê yekê, diyar e ku wê hevsengiyên heyî ji nû ve bên sazkirin.

Di van hesengiyên nû de, cihê kurdan ango tevgerên kurdî hîn jî ne diyar e lê tişta diyar û aşkera ew e ku bazariyên li ser hebûna kurdan êdî wisa bi hêsanî nikarin bên kirin.

# Dêlindêzeke qurbanê ya jibîrçûyî;
# Qidika Qidîşkê



*Rîtuela me ya qurbanê, Qidika Qidîşkê, ji bo derbasbûna kew (leke)eke zikmakî ye ku li gorî tibê bi piranî di pişt an jî kemaxa zarokên rengesmer de tê dîtin û hetanî 4 saliyê jî ji ber xwe ve winda dibe*

Alik X

Hin caran ji ber xelasiya xezebekê, hin caran jî ji bo hasilbûna miradekî lê di axiriya axirîn de, armanca kiryara qurbandayînê û wek sedem jî kirûya qurbanê, ji “baweriyê” dol digire û têkiliya wê ya bi baweriyê re qewî ye. Û bi piranî jî bi rijandina xwînê bi encam dibe qurbandayîn. Ji me gelekan ve eyan in xewnên Hz. Brahîmî; yên weke wehiyê nazil dibin bi riya Cebraîlî. Ya ewil mizgîniyek e: Cebraîl pê dide zanîn ku dê miradê wî hasil bibe, dê Xweda kurekî bidiyê. Lê piştî çend salan, xewnên wî yên din vediguherin kabûsan û li ser hev dubare dibin. Û belika guhê Hz. Smaîlî xwê nade, ew jî bi qasî bavê xwe bawermend e, ji loma wiha bersiva wî dide: “Bavo, pêk bîne ya li te hatiye fermankirin. Bêguman tu yê min bi dayoxan re bibînî.” Piştî ku kur û bav bi vê dilsoziyê tên azmûnkirin, kêr qelp dike li Mînayê, Xweda di wan de dibihure û Hz. Brahîm bi beranekî tê xelatkirin ku Habîl ji bihuştê jê re dişîne bi riya Cebraîlî.

Lê bi tenê ne ev e mîtosa qurbanê; gava mirov ber bi bêndera mîstîzmê, ber bi Grekistanê ve diqedime, mirov dibîne ku xwedawendên wê mîna Xwedayê îslamê ne dilbirehm bûne. Li wir, di şibiyeta ya îslamê de mîtosek hebûye, di mîtosê de jinek; jineke ku wek a Hz. Smaîlî kaba wê mîr nehatiye… Tê gotin ku piştî wê jinê pêlên xwîna mirovan li nav grekan dibe ‘Ey Av û Av’. Çîrok wiha ye: Di herba Trûwayê de, ji bo ku Menelaûsê qral tola xwe hilîne û jina xwe rizgar bike, bi serfermandariya birayê xwe Agememnonî yê qralê Argosê, artêşekê li hev vedihewîne, ji her derê Grekistanê qral beşdariyê li vê seferê dikin û li keştiyên xwe bi navê “akhaîo”yan siwar dibin, li benda Xwedawendê Bê dimînin ku bê li wan bigobilîne da ku babirkên keştiyên wan bi bê tije bibe û bi rê bikevin. Lê xwedawend ji bo berdêla vê daxwazê, ji Menelaûsî dixwazin ku ew keça xwe Îphîgenîayê bike qurban. Piştî ku Menelaûs ev fermana wê bi cih tîne û avê li keça xwe venaxwe, ba li wan digobile, babirkên keştiyên wan bi bê tije dibin û digihîjin Trûwayê.

Û dibêjim qey di meseleya qurbanê de, kes bi qasî aztekên ku li Amerîkaya Naverast jiyane, ne xedar e; yanî wan sola gelek şaristaniyan di taqê re avêtiye bi erjengiya xwe. Dibêjin stêrka sibê, Venus, li nav aztekan weke nîşaneya bêyomiyê dihat dîtin û wan Venus bi xwîna dilê dîlên xwe aş dikir. Erkdarên wan ên dînî mohra xwe li vê kiryarê didan; gava qurban hîn sax bûna, radihiştin kêrên xwe yên kevirî û li dilê qurbanan dixistin, dilê wan ji sînga wan vediqelaştin! Tê angaştkirin ev rîtuela ku bi navê tirsa asmanî dihat binavkirin, ji alî hin civakên din ên li Meksîkayê ve hatiye parastin û jiyandin.

Heçku dê ev her sê mîtos bes bin û dema mirov ji cografyayên dereke berê xwe bide Kurdistanê; di Kurdistanê de jî bi taybetî dide herêma Omeriya, ne bi xezeba aztekan be jî, dibîne ku me jî qurbandayîneke ecêb ya xwemalî hebûye. Çima bi taybetî Omeriya? Ji ber ku ev sedsal têra xwe bi adan e, ji gelek herêmên din ên Kurdistanê min jî gelek nas û heval hene û wexta min xwest vê nivîsê binivîsim, ji Torê, heta Bota û Serhedê, min ji çendik û çend camêr û canikan pirsî bê ka ev a ez ê çend hevok şûnde binivîsim li cem wan jî heye yan na. Wan bi piranî ez bi neyînî bersivandim. Belkî hebûye lê hatiye jibîrkirin…

Rîtuela me ya qurbanê, Qidika Qidîşkê, ji bo derbasbûna kew (leke)eke zikmakî ye ku li gorî tibê bi piranî di pişt an jî kemaxa zarokên rengesmer de tê dîtin û hetanî 4 saliyê jî ji ber xwe ve winda dibe. Gava zarokek di navbera 1-5 saliyê de be û mirîşkên malbata wî jî pir bin, ji ber ku kew jî hinekî reş e; bi taybetî dîk, mirîşk an jî ferûckeke reş tê serjêkirin û hemsalên wî/ê zarokî/ê yên taxê tên ezimandin, ew pevre jê wê xwarinê dixwin. Tê bawerkirin ku ji vê qurbanê şûn de kew derbas dibe. Min hinekî din jî bi ser vê baweriyê de ajot û li gorî ku mezinên malbata me ji min re qal kirin; wan bawerî heye ku ew kew şûna boçikekê be, ji lewma, ji bo rizgariya ji wê boçikê ew keferat tê dayîn. Bêguman, ev bawerî nav û nûçikên nijadperestên tirkan tînin bîra mirov û mirov pê aciz dibe. Lê belê ew mezinên me, bi qasî ku tûşî nav û nûçikên bi vî rengî bên, tirk nas nekirine. Ji ber vê yekê îhtîmal heye ku ev dab ji serdemeke dêrîn mabe û gihîştibe heta îro… Û ji van dêlindêzan cudatir yeke îdeal heye ku bi mirov xweş tê. Ew jî ya pêşiyên me yên zerdeştî ye; dîroknas radigîhinin ku beriya zerdeştî di destê sasaniyan de deforme bibe, wan ji bo her zaroka/ê ku ji dayik dibû darek dişitiland.

# Guh pereşût in!

Helîm Barîn

Mirov, li pey wateyan in. Bi vê taybetîya xwe, ji zindîyên din vediqetin. Wate, têgehek e ku tenê bi mirovan ra eleqedar e. Ajal, her çi bin, ew in, wek xwe ne. Bi ajoyan dijîn. Hewcedarîya wan bi çandê tune û bi filozofîyê jî; jiyana xwe tevlîhev nekirine. Em çîrokê dizanin: Ji çilpayê dipirsin “tu çawa bi çil pîyan dimeşî, tu gavên xwe tevlîhev nakî?” Çilpaya reben ku timî bê problem dimeşiya, cara ewil li ser meşa xwe dirame û hew dikare bimeşe. Ramîn, îş xera dike. Lêbelê, ew qonax ji mirovî bihurî an jî mirov ji wê qonaxê bihurî. Êdî mirov bi hewla famkirinê dijî. Diponije, dirame, difikire, xayîz dibe. Ramyar Cîoran dibêje, “bê nan dikarim lê bê peyv nikarim bijîm.” Em mirov, nema dikarin bibin wek çilpayan. Em ne wek xwe ne loma jî em li xwe digerin. Ji bo wek “xwe” bin li ber xwe didin: Lê gelek caran ev berxwedana xwebûnê dibe xwe-ber-dan û ji xwebûnê dûr dikevin.

Ev wateya ku em li pey wê ne, xwe bi lêkera famkirinê ron dike. Wate ji bo bê famkirin heye lê ji bo wê jî şertê ewil ê famkirinê, guhdarîkirin e. Wate, berhema guhdarîkirinê ye. Dema em dibêjin ziman, divê bi tenê axaftin neyê bîra me. Guh, parçeyekî mezin ê vê meseleyê ye. Heta em dikarin bibêjin ku di vê çarçoveyê da guhdarîkirin, çavkaniya zimên e jî. Ji ber wê em bi qasî zimên divê doza guhên xwe jî bikin. Guhdarîkirina “zimanê mêtingehîyê” pêvajoya bişaftinê ye, axaftina pê encam e. Ger bişaftin nexweşîyek be, tiştên ku em dixwînin û guhdarî dikin jî sedemên vê nexweşîyê ne. Ji ber wê jî ji bo pêşiya bişaftinê bê girtin em li şûna ku bibêjin bi kurdî bipeyve, divê em bibejin li kurdî guhdarî bike. Mirov li çi guhdarî bike wêya dike! Loma jî “Xwebûn”ê bixwînin lê guhdarî bikin.

Mêjîyê ku alîyê bîyolojîk ê aqil e, di navbera ziman û guhan de pireke efsûnî ye. Di eslê xwe de ziman jî, guh jî, wek ku parçeyên aqil ên sirgûnkirî bin. Cezayê wan ê sirgûnê jî ev e: bi tenê ragihandin. Di serdema me de şûna dîyalogê ragihandinê girtiye. Guh li şûna ku guhdarî bike, dibihîze; ziman li şûna ku biaxive, bi lêv dike ! Lê “(…) îro kes napeyve (ji xeynî kesên ku peyvên hatine gotin dubare dikin) çimkî xuya ye ku şîret, nûçe hawar û qêrînên hêzên kor û kerr natebitin. Tişta ku min van salên dawî dî, bawerî bi mirovan re nemaye. Bawerî ev bû: dema bi zimanê mirovatîyê biaxivî ew ê teqez weke mirovan bersiva te bê dayîn (…) dîyaloga dirêj a timî di navbera mirovan da diherîkî, xelas…” (Camus, 1937). Ger weke Camus dibêje; dîyalog xelas bûbe, ziman û guh bi kêrî çi tên? Nûçegihanî? A rast wek karekî, nûçegihanî bi qedr e lê ger rengê axaftinê-dîyalogê bişibe nûçegihanîyê, em ê xwe qet negihînin sedemên sereke yên wan nûçeyên xerab ên timî bi serê me de tên. Nûçe behsa bûyeran dike lê bo famkirina wan bûyeran, têgeh divê, diyarde divê.

Mirovên serdema modernîteya kapîtalîst guhên xwe kirin pariyek goşt û xwarin! Êdî bi zikê xwe dibihîzin. Ne ku guh tune, mirov kerr bûne, bi tenê ji bîr kirine ku guhên xwe bi kar bînin. Çimkî ger şûna wateyê, ajoyan dagirtibe, ew ê karê guhan jî zik bike. Loma mezinên me şîretan li me dikin, dibêjin; “Pereyên te hebin, ew ê li te guhdarî bikin.” Ji ber wê jî, guhên te tune bin jî dibin. Feqîyê ku digot “Uznan (guh) ku sewta xweş divê” niha bijîya, ew ê wiha bigota: “Ji sewta xweş ra guh divê.” Rewş dişibe çîroka Gogolî ya Poz. Zilamê me rojekê şiyar dibe û dibîne ku pozê wî tune ye. Li pey pozê xwe diçe. Ger mijar ne Poz lê Guh bûya, ew ê wiha dest pê bikira çîroka me: Rojekê şiyar bû li eynikê nêrî, dît ku guhên wî li ciyên xwe nîn in û dûra dest bi firçekirina diranên xwe kir. Li pey guhên xwe jî neçû. Ji ber ku ger ajo, ajokar be, guh barekî bêmane ye.

Sedemên gelek şer û pevçûnên rojane yên di nav civakê da diqewimin ne-guhdarîkirin e. Mirovên ku li hinekan hêrs dibin wisa dibêjin: “Naxwazim li te guhdarî jî bikim.” Erê, ji ber ku îhtîmal e ku piştî guhdarîkirinê wê lêborînê bixwaze. Rewş ev e: Lê guhdarî nekir û kuşt lê guhdarî kir û jê lêborîn xwest. Belkî divê hevoka “ez ji te hez dikim” veguhere, bibe “ez li te guhdarî dikim”. Di nîqaş û şer û polemîkan da jî guhên me wek pereşûtan e. Ger tu baş bi kar bînî, baş bel bikî, nahêlin tu bi serserkî bikevî erdê.



# Bêedalet Aştî Nêbeno



Av. Cemile Turhalli



“Sey tofanî bi. Qiyamet asmên re ameyo war. Hewarê qêrayîşî vera çimi çiman nêvînaynê, Vengê tifingî senî amey, solonê xo pay nêkerd û xo keye ra eştî teber. Tay pê ereba, tay zî pê lingan vazdayî. Heme çîyê xo, pênîya xo de vera dayî. Waştêne xo biresnî koyê Şengalî. Heta nika koyê Şengalî paştî da înan, înan rê bî sixinakêko pîl. Heta nika kal û pîranê xo ra mûsayî, xo koyê Şengalî de bipawî, ko înan gêno verera xo û înan keno pistina xo û temernena. Kal û pîrê înan verê vatêne; ma ser o 72 fermanî viraziyayî û koyê Şengalî ma pawit û xelesna. Gere xo biresnayênê verestîya koyê Şengalî. Heta verestîya Şengalî nêvînî xelesnayîş çîn o.

Vazdayî heta koyê Şengalî. Tîje înan rê bî dişmin, leşe înan, înan re bî kerra. Fekê înan rengê erdî girewte û çim înan bî tarî. Binê tîje de, bêsol, verêra înan de tutê qij, pêyniya înan de kal û pîrî vazdayî. Heta nika vernîya xo dayên tîje dua kerdî. Nika zî tîje bedenê înan rê bîya dişmin. Nêeşkênî rayîr şerî. Tayî senî solanê xo vera dayî, na rey tutanê xo yê qijan vera dayî. Kal û pîranê xo zî vera dayî. Gere nêewnê pênîya xo. Kam biewnîyayêne pênîya xo neşkênî ling bierzo/a. Yew verestîya derg pîl kewtenê lingan înan, lingan rê bedenê înan û bê helm verdêne verdîyane û kewtenê war. Zanayêne na verestîya sîya cellat, Ezîdîxan re kiştiş û qirkerdiş ana. Bi hezaran Ezîdî xo resna koyê Şengalî. Zanayêne meleka tavusî înan exta de tenya nêverdena û înan miqate kena û pawena. Ê çendêk awer şiyênê pêynîya înan de verestîya sîya zî waştêne xo biresna înan. Verestîya derge quwetê koyî nêzanayêne, xo senî bi fetelna. Senî verestî xo resna koyê Şengalî, 7 tavusê melekî zerrêyê koyî ra veciyayê. Ezîdîyan girewt xo dima û înan heminan xelesnayî. Verestîya derge remaye. Zanayêne koyê Şengalî înan beno mezel, o çax fek Ezîdîyan ra vera daye. Hezar Cemaatê Ezîdîyan heta quwetêk bêro bêşom û bêawe 7-10 rojan xo viyarna. Tayê tersî ver, semedo ke nêkewî destê DAIŞî, namusê înan wa nêxerepîyo xo koyî ra eştî war. Tayê vêşonî ra û tayê zî têşonî ra bêhal biyî. Tayê hesron xo, tayê gonîya xo, xo rê kerdî awe. ”

Roja 3ê Tebaxa 2014î de verê çimanê dinya de yew jenosîd virazîya. Ezîdî na rê vanê fermanê 73. Na roje de vahşetêk pîl amey serê Ezîdîyan. Seserra 21. de jenosîdêk pîl û trajik amey serê Ezîdîyan. Mezg û zerrîya înan de timî qirkerdiş estbi. Zafînê qirkerdişan cîran û embazan ra ameyî. No hewe zî kirvê înan inân re bêbextî kerdî. Şewe kirvon xo reyde pîya şamîya xo werdê, la sere sibayî cîrananê xo re biyî arayî.

Bi hezaran Ezîdî ameyî kiştiş, bi hezaran ganî-ganî eştî zerê mezelan, bi ganî-ganî herre eştî înan ser. Hereketo radikal cihadist DAIŞ bi hezaran cînî û gedeyan esîr girewt. Heme sey kole ameyî rotiş, lajêkî yê ke hema emrê înan 11î ra cêr bî kerd leşker û ê bîn zî ameyî kiştiş. Gedeyanê lajekan kontrol kerdêne, ê ke binê çenganê înan de muye/pirç vejîyayî kiştêne. A kênayên ezepan rê zî kontrolê bekarîtîye kerdene. Qijan ra heta pîlan dest eştêne heminan. Kêynayê rîyê xo kerdêne tenî û semedo ke înan nêberî vatêne ma zewejnayeyî. Ê vajî nêvajî zî êdî havilek înan rê çin o. Kesêk bawerîya xo bi kênayan nêkerdêne. Dest eştenê înan û cira kerdêne. Ciniyan ser de şîddetêko cinsî ê sîstematîk kerdêne. Zafînê kêna û ciniyî çend serrî ra dima pê pere rotişî xelesîyayê. 500 hezar ra cor Ezîdîyî keyê xo veredayî, koçê çar perçeyê dinya kerdî û vila bîyî. Nika destê DAIŞî de hema 3 hezar cînî û gedeyî estî. Yew nêzano ke nê hê ça de yî. Aqubetê hezaran camêrdan nîno zanayene ke ê se bîyî. Vera vera mezelê pêserbaye abenî û aqubetê înan uca ra vejîyêno. Zafînê mezelê pêserbaye anebîyê. Mîyanê mezelê ke abîyê de camêrd û ciniyê 60 serre ra pîlî estî.

Zafînê Ezîdî cayê xo ra bîyî û bîyî koçber. Koçbertî înan rê zulmê newe ard. Rayirê okyanusî de awe înan rê bî mezel. Ya kewtî destê tacîrê merdiman ya zî kewtî kampanê koçbertî yê dewletan. Yanî remayîş înan rê çare nebî. Gedeyê kênayî 7 ra bigêrên heta 17in heme ameyî rotiş û ameyî îstîsmarkerdiş.

Ê ke xo resnayî dewletanê pîl û zilmkaran, Ewropa zî înan ra fek vera nêda. Çimkî ziwan nêzanayêne. Zafînê înan cînîyan bî. Zafînê cînîyan belkî des rey, vîst rey, se rey ameyî rotiş û ameyî îstîsmarkerdiş. Her roja newe înan rê sey mergî bî. Bi çimanê xo kiştişê wayanê xo û birayanê xo dîyî. Gedê dayîkan bi zorî dayîkanê xo ra qerefnayêne. Camêrdî, cînîyan kerdî mulkê xususî. Bi zorî kerdî bisilman. Taye seba ke hewl dayî biremî ameyî kiştiş, taye bombardûmananê koalîsyonî de merdî, taye birîndar bîyî û taye zî hawayêko dramatîk jehr werdî û xo kiştî. Dinya înan re bî cehnime.

Çi heyfo ke ê ke xelesîyay zî hona bi rotiş ameyî xelesnayîş. Tayê netîceyê tecawuzî de bîyî wayîrê tutan. Cemaatê Ezîdî tutan qebul nêkerd, o çax nêeşkayê tutanê xo, xo reyde bîyarî. Mecburî gedê xo yurdan de bi ca kerdî. Irak û Rojawanî de vera dayî.

7 serrî ra bigêrî heta 70 serrî heme bîyî koçber. Bêziwan, bêdadî, bêbavî, bêway û bêbira cayê xo de bîyî belangaz. Ge Elmanya ge Fransa ge Kanada û ge zî Avustralya de caye bîyî. Hemin sey hebê tesbîhi vilayê her cayê dinya bîyî.

Polîtîkayê entegrasyonê dewlete înan rê bî zilmêk newe. Zanayêne no polîtîkayê dewlete reyde Ezîdîtî do vîn bibo. Zanayêne dûrê Ezîdîxanî ra yew cuye nêbena. Na rewşe de heme kewtî tezîye. Goşê înan sade Ezidîxanî de bî. Cilan sipîyan nêdanî xo ra. Her roje yenî vere yewbînenî hawarîya dejanê xo kerdêne. Vatêne heta ke esîrî nêxelesîya rûh ma zî nêxelesîyeno. Heta kênayê ma nêrî ma ver, ma hê binê erdî de yî. Heta lajê ma nêrî ma ver, ma bêvengî. Heta mêrdeyê ma nêrî ma ver, ma bê nefes î. Heta kal û pîrê ma nêrî, çimê ma tarî yî.

2015î de pey çimanê huqûqnasîya xo mi rewşa Ezîdîyan dî. Ge ez şîya Kampa Sileman Iraq û ge zî ez şîya Kanada mi înan reyde pêvînayîş viraşt.

Mi çiqas înan reyde qalî kerdêne, zerrîya mi qesîyayêne. Mi bênefestîya înan û belangazîtîya înan pê çimon xo dî. Hawarîya înan zerrîya mi dejnayêne. Mi zanayêne sebebê zilmo ke dîyî Kurdîtîya xo û Ezîdîtîya xo ra bi. Heta nika 73 rey ameyî qirkerdiş. Dewa înan, keyeyê înan bîyî mezel. Desmalî înan, înan re bîyî kefen. Hesirê înan, înan rê bîyî awe û awe înan, înan rê bî laser. Yew keye ra yew merdim ya xelesîya ya zî nêxelesîya. Her tim gere xo bipawitêne. Bawerîya înan hema zî xelesîyayîşê merdiman rê estibî. Keye û her ca de fotografê esîranê înan estbî. Deyîrê dejin ê înan nêqedîyayêne. Cilan sîya xo ra nêvetêne. Vêyveyan bêveng kerdêne. Yew nêzanayêne ke merdim meymanê înan o. Merdim xo sey ferdê keyeyê înan vînayêne û hîskerdêne. Bawerîya înan kesêk nêameyêne, la hona zî sofrê înan her tim her kesî rê akerde û dekerde bi... Ciwanan emrê xo emrê dinya ser vînayêne. Sukunetê xo pawitêne. Her tim şibakanê xo qefelnayêne... Perdeyanê sîyayan eştêne ser şibakan.

Ezîdi milletêko qedîm o. Heta nika des hezaran rey kulturê xo û bawerîya xo, vernîya xo dayî tîje û înan pawit î. Nêvatêne no qeder o. Qederê ,xo fetelno û bibedelno. Ne fikrê xo ra ameyî cêr û ne zî ziwanê xo ra. Ziwanê Kurdî ge-ge înan rê bî embaz, la ge-ge zî bî dişmin. Dişmintî û bisilmontî sey yewbînan bî. Hemrayî û embazîya înan zî serê kokanê înan de zergun bîyêne. No kok înan giron, ziwan û qedera trajik o.

Nika ma zonî 7 leşkerê melekê tavusî Ezîdîxan feletna. Ezîdî êdî zanê ke kokê înan vîn nêbeno. Heme vila bîyî, wazenî kokê xo ra biresî. Sey pelê daran vilayê her cayê biyî. Nika wazenî biresî ristêmi xo. Ristim înan ho Şengal û Şexan de yo. Nika cînîyî Ezîdîxan de bîyî hêz û xo pawenî. Ezîdîtî senî cînî ra dewom keno, têkoşîn zî ser cînîyan beno awan. Dişmin û embazanê xo zanêne. Trajedîyê xo kerdî xelesnayîşê dinya. Zanî ke ganî yew cînî daxî destê nê cellatan de esîr nêmana. Zanê ke qirkerdiş tena Şengal de nêvirazîyayî. En zîhnîyet Zîlan ra bigêre heta Dêrsimî, Enfalî ra bigêre heta Gimgim, Pirsus, Sûr re dewom kerdo. Êdî qebul nêkenî ke no qederê cografyaya înan o. Qeder cînîyan bedilnayî kerdî xelesnayîşê cînîyan. Xelesnayîşê cînîyan bedilnayî kerdî xelesnayîşê dinya. Ne dinya ra vêrenê, ne zî xo ra vêrenî. Vengê tîlîlîyê ciniyan kewt verê tifingo. Tilîlîyê cînîyan bîya vengê dinya. Dismala cînîyan bîya ala dinya. Munîtîşê porê ciniyan bîya ristimê Ezîdîxanî.

No ponc serrî de waştişê pêroyê Ezîdîyan o yo ke, bêrê tepîya agêrî Ezîdîxanî. Tewr vernî zî statuya xo wazenî. Wazenî bi statuya xo, bi meclîsê xo û bi koma xo bicuwîyê.

Wazenê ke çîyê ke ameyî sereyê înan, suçê Mîyanneteweyî ser yew Mehkemaya Cezaya Mîyanneteweyî virazîya û ena mehkema wa sucanê mîyanneteweyan ser o xebatan bikera. Kesê sucdar wa kamî cezaya xo bigêrî. Kam paştîya lojîstîk û fînansî dayo/a, kam cû dewlete paştîya daya no sucî, wa bêrî eşkerakerdiş û teşhîrkerdiş. Heta dewletî nê sucan eşkera nêkerî, nê sucî nêqedîyenî. Nika sucdar nêrî cezadayiş, nê sucî kewenî milê pêroyê dinya ser. Dinya de zelalî bi edalet beno. Global tekoşîn xo reyde global edalet ano. “Heta ke edalet nêbo, aştî nêbena.”(Carla Del Ponte)



Kewê Redkan

# Jinika jîr...

Dayê nizam bextê min e, yan jî bêbextiya hinekan e! Ez bi ku de herim, çi bikim jî hemû caran bêbextiya hinekan derdikeve pêşiya min. Em gundî, li gundê xwe û di navbera xwe de di hemû kar û baran de alîkariya hev dikin; her kesek destê xwe diavêje karekî û em bi ser dikevin.

Lê di nav me de jinek heye, xwedê neyne serê tu kesekî. Em hemû ji wê hez dikin, xeberxweş e, sivik e, di mala xwe de wisa jîr e ku meriv nizane ew wan karên giran bi tena serê xwe çawa dike û bi lez û bez diqedîne û xwe li bin dara ber derî dirêj dike.

Ya me jî, heta em zikê zarokan têr dikin, heta em mêrikê malê bi rê dikin, heta nav malê didin hev, em hew dibinin ku dîsa êvar bi ser me de hat. Mehên havînê, em hemû cînar, ji bona tivdarekên zivistanê bi ber hev de bînin, alîkariya hevûdu dikin. Rojek mala min, roja din mala cînara min, rojtira din mala cînara din û wisa. Duh em li mala Heydê bûn. ( navê wê yê rastî Hediya ye, lê em bi kurtasî jê re dibêjin Heydê) Heta êvara dereng û bêrawestan, me kar û barê Heydê kir. Bê malmiratê koma te ewqas mezin ji nîne, tu dibêjî ew ê haziriya deh salan bike, bi xwe jî dema devê xwe vedike, mecalê nade kesekî ew jî du heb û sê heb peyvan bibêjin. Heta êvarê virt û virt. Dîsa jî me di navbera xwe de got; heyran dema karekî dike, dev jî dixebite û dest jî; tişt nabe, em ê carna guhê xwe bigirin, hema bila kar biqede...

Weyla bexteqar li serê min hatê. Dema dor hat mala cînara min a din, em bi kêfxweşî li ba hev civiyan, kêf û henek, xwarin û vexwarin, tu dibêjî qey em di nav daweteké de ne û mil bi milê hev direqisin. Me dî Heydê hinekî dereng û bi rû pirçî hat, xwe da kêleka min, of û pif kir, got ez îro qet ne baş im, serê min, madê min, dest û lingên min diêşin lê ez ê alîkariya we bikim. Me jî got; heyran ger tu ne baş bî, here malê, hinekî bi ser xwe de were, roja din were em herin mala cînara din. Got erê û çû.

Rojtira din nehat, çend rojan li ser hev got ez hê baş nebûme lê ez ê bêm alîkariya we. Paşê nizam çi bû, me got hela ka em herin pirsa wê bikin gelo baş e an na! Em çûn ber derî, me dî ne li malê ye, em bi aliyê malê de vegeriyan. Wiii, Heydêya me li paş malê bi dest û lingan ketiye nav heriyê, tendûrê çêdike. Gava çav li me ket, hema xwe avête erdê, wî serê min, wî diranê min, wî pişta min, vir de û wê de. Qutê got; qet tu şerm nakî, em hemû hatin mala te, me hemû tedarikên te yên nizam çend salan çêkirin û dagirtin. Dema dor hate me te got ez nexweş im, waye tu ne nexwaş î, tu ji me hemûyan qewîntir î, tu ji me jîrtir î, em nikarin ji te re tiştekî bêjin, sala pêşiya me em nayên mala te, got û got.

Em wisa hatin xapandin, bi dilekî xemgîn vegeriyan. Di navberê de çend roj derbas bûn, me dî waye Heydêya me, di destê wê de beroşên xwarinê, hat ji me re sifre danî, nizam çend cure xwarin çêkirine, hazir kir, em jî wisa bala xwe didinê wê gelo çi bêje ji me re. Got; werin heta we xwarin xwar, ez ê li şûna we bixebitim. Me dengê xwe nekir, li dora sifrê rûniştin, heta me xwarina xwe xwar, Heydê hemû karê me yê wê rojê bi tena serê xwe qedand. Qutê vegeriya jê re got; ger dil bixwaze, dest û ling jî hêzê didin, me tu efû kirî vê carê li careke din hay ji xwe hebe. Lê Heydêya me her tim wisa ye, jîr e lê ku bixwaze xwe biwestîne...




# 'Doşeka maneyan tije nabe'




Hema bi kurtasî bê lome be, 'seyda û se'. Bi qasî gotina 'qantir za' acêb e. Li vê dinyayê tiştê ku neyê serê mirov tune. Tu nav badilhewa li mirovan nayê kirin. Navê seyda li gor navê zanîstî prof e.

Seyda, dema ku lê biqewime gerek karibe li çareya serê xwe binêre . Seyda rojekê ew û çend heb feqiyên xwe, di kelekela germa havînê de wê biçin mizgeftê. Gava seyda nêzî hewşa mizgeftê dibe, ji feqiyan re dibêje destnimêjê bigirin em ê li hêwanê nimêjê bikin. Ê seyda bi aqil in. Ew berê bi destnimêj e. Dema derbasî hêwana mizgeftê dibe, lê dinêre seyek ji ber germa havînê li ser merşa mizgeftê mexelkî razaye. Li gor baweriya mezhebê seydayê şafî gereke ew der bi axa sor were şûştin û helal kirin.

Gava seyda şûştina merşan û paqijiya mizgeftê tîne ber çavên xwe diheyire. Me berê jî gotibû gava li seydayan biqewime dikarin li çareya serê xwe binêrin.

Seyda li seyê razayî dirana diqiriçîne û bangî feqiyan dike. Dibêje hûn ji min re mircaqekî bînin. Feqiyê reben yekê nake dudu mircaq dide seyda. Seyda difilite ser se, wî di ber hev de dikute.

Se ji ber êşa laşê xwe dike kûzekûz. Seyda hem li se dide hem vê gotinê dubare dike.

Seyda dibêje tu bikî kûzekûz, nekî kûzekûz jî tu "bizin" î. Gava ku seyda fitûye ji se re nebîne mecbûr e hemû çilên mizgeftê bişo.


Li navenda Şirnexê ûzmanek dest dirêjî li zarokekî 10 salî dike. Elî û Weliyê dewletê dibêjin ew ûzman serxweş bû!

Gelo wî ûzmanî bi serxweşî tu kesî kiriye mêvanê diya xwe, xwişka xwe an jî keça xwe.

Gotineke Victor Hugo heye dibêje, "Wijdanê mirovan xwedayê hundirê mirovan e". Gava ku Xwedayê hundirê mirov bixurife ferîşte dest bi qûndetiyê dikin!

*Sabrî Vûral*

# XAÇEPIRS



### JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Bilindahî, tirmalê ji erdê bilind 3. Zevî û çandiniya ku tê avdan 5. Keser, nalîn 6. Awa 7. Meydan 9. Evîndar, aşiq 12. Ta û giyayê ku tê rêstin 14. Cejin 15. Zengîn, xwedî mal û milk 17. Vexwarina mirovan a sereke 18. Bersiva neyênî 22. Zimanzan

### JI JOR BER BI JÊR

1. Tev, bi temamî, hemû 2. Rih 3. Yan, yan jî 4. Kar, xebat 5.Sembola jinên kurd a berxwedana Kobanê 7. Cêrî, berdestka xizmeta malê dike 8. Alaveke kevin a çandiniyê, pê nîsk diçinin 10. Ax, zemîn 11. Şanenava ku ji ber navekî ve tê nivîsandin 13. Meha nehem a zayînî 14. Perestin, perestî 16. Lewre, ji ber ku, ji ber wê 19. Kok û reha kurd, faris û hin gelên din 20. Kurt, ne dirêj 21. Di lîstika kaxizan de karteke girîng 23. Tûj, har

## Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| D | E | M | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | D | O | R | ■ |
| E | ■ | O | ■ | ■ | R | A | D | E | ■ | E | ■ |
| F | I | R | O | ■ | A | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |
| ■ | ■ | Î | ■ | ■ | Y | ■ | V | I | R | ■ | ■ |
| S | A | K | Î | N | E | ■ | Î | ■ | E | ■ | ■ |
| ■ | X | ■ | ■ | A | ■ | ■ | N | A | B | E | ■ |
| N | A | ■ | ■ | M | ■ | ■ | D | ■ | ■ | V | ■ |
| E | ■ | ■ | D | E | R | M | A | N | ■ | Î | ■ |
| W | E | ■ | ■ | ■ | I | ■ | R | ■ | ■ | N | O |
| R | ■ | ■ | D | ■ | Ş | ■ | ■ | K | ■ | ■ | D |
| O | ■ | H | Î | N | K | A | R | Î | ■ | ■ | E |
| Z | ■ | ■ | L | ■ | ■ | R | ■ | ■ | ■ | ■ | ■ |



Weswese 2

**Şener Ozmen**

# Dax

**Strana Ew î Ku Diçe**

diçime bajarekî nû
pê dizanim
ez ê li wir jî binivîsim
tûrikê min mişt bi tîpên xav

hogirno, diçime bajarekî nû
selbendî, kuçeyên bêpeyase
ku berejêrî deryayê dibin
û darên bedew, evînên min

ez ê li benda reşbelekekê bimînim
ez ê pala xwe bidime xema xwe
ez ê bibêjim û bigirim, hey bigirim
"bi tenê tu yar î
bi tenê tu ne sozdar î lê lê"

dil bihar
ez ê vê stranê bistrêm
ez guveguv, tu daristan

Kawa Nemir, *Ji Bîşenga Deşta Dûr*

Helbestvanê min î gewre yê salên min yên xortaniyê *Vladîmîr Mayakovskî*, di serhilbûna xwe ya Amerîkayê de kat kiribû; *"Min hêja Chicago dît û destana xwe raberî Chicagoyî-yan kir. Ne mizicîneke mizawir li rûye wan hasil bû, ne jî milikê xwe hilkirin… Berevajî. Min dît ku kartêkirina wê baş e. Lewre, destana min rûçikê din ê Chicagoyê rêyî wan dabû."* Herçî ez bûm, min hîn *Chicago* nedîtibû û destaneke min a ku rêyî wan bidim jî –ji xên *'tîpên min yên xav'*– tune bû. Dewletin hebûn, helbestvanên xwe yên mîna *Ezra Poundî* avêtibûn binê tîmarxaneyan, yê ku gotibû; "Amerîka tîmarxaneyek e." Heman dewletê, di wan rojan de yekemîn xelata helbestê ya dewletê jî –fena ku tinazên xwe pê bike– pêşkêşî helbestkêr kiribû. Heye ku rast bû, heye ku Amerîka tîmarxaneyeke berra bû û Pound, dojeha xwe ya li vê cîhanê, bi çavên seriyan dîtibû lê wisan be jî, ometek regez, bêyî ku hevûdin bi qaqa reş asê bikin, li ser erdê wê dijîyan.

**Çend lêpirsîyarîyên lasayî**

Çaxa balafira me serê pozikê xwe zivirand Amsterdamê; dilê min çargopal lêdixist. Ji tirs û şayîşa ku dê polisên tirk (ku berîya bi saetekê, min her sê pasaport û belgenameya fermî ya destûra derketina derveyî welêt radestî wan kiribû û wan jî li ser qedexeya derketina derveyî welêt û rewşa mamosteyan bi pistepist peyivîbûn da ku hema li wir aqilê xwe bavêjim), têkevin zikê balafirê û rasterast bên nik me û me ji balafirê derînin, wek gayê ku li kêrê binêre, min çavên xwe kutabûn derîyê balafirê. Xweşbextane, senaryoya min a tehlûtirş bi pêk nehat, belam dîsan jî, çawan vebibêjim, ez di nava niq û fiqê de bûm, qey ev jî qedera min bû, nizanim êdî! Piştî ku em gihîştin *Balafirgeha Schipolê*, kabirayekî bedlekî reş li xwe kirî, ji nava ewqasê mirovan bi tenê nav û paşnavê min hilda û bi tirkîyeke bi şêwaza amerîkîyan got: "Ji kerema xwe re bi min re werin, ez ê çend pirsan ji we bikim…" Me jî da dû wî û em çûn, kabira li pêşberî laptopekê dasekinî û bi dû çend tik û mikan pirsên xwe arasteyî min kirin:

"Ji kerema xwe re bibêjin wekî hûn bi çi sedemê diçin Amerîkayê?"

"Ez hunermend im, min serî li bûrseke hunerî dabû, ji ber hindê…"

"Gelo tu dişêy hinekî qala hunera xwe bikî?"

"Wekî çi?"

"Tu li ser çi dixebitî?"

"Li ser vîdeo û wênesazîyê…"

"Vîdeoyên bi çi rengî? Gelo tu dişêyî qala vîdeoyên xwe bikî? Ez dixwazim tu min serwext bikî…"

Rabûm min kurtemêjûya hunera vîdeoyê jê re kat kir; wekî di kîjan salê de derketiye, bi çi awayî bi pêş ketiye, ciyawazî û pêwendîyên di navbera sînema û vîdeoyên hunerî de çi ne û ez çi dikim. Kabira gelek cidî bû gava ez wiha, fena ku ez di guftûgoyekê de bim, dipeyivîm.

"Min bibexşînin Mr. Ozmen, belam ez tênegihîştim… Ev çito huner e?"

"Hevçax dibêjin… ez jî hindê dizanim…"

"Baş e, spas dikim. Fermo pasaportên we, ji kerema xwe di vî alîyî re derkevin."

Şaş û metel bûbûm ji vê lêpirsîyara nepayî. Tam û temam du saet û nîv hebû bo firîna me ya duwemîn re. Me yê pariyekî tapa xwe bihanîya, em ê bêxew û tengezar bûn. Şeva berîn, li Stembolê, li jûra wê otela bimêrês ya li Taksimê, ji xem û xereqan xew neketibû çavên min û Zelalê, herçî Robîn bû, ji ber talaşa ku –bêhtir ji ber coş û peroşa balafirê û hizra çûyîna Amerîkayê– ez ê wî di tarîya şevê de şiyar bikim, zû raketibû. Me jî xwe bi temaşekirina televîzyonê û çixareyê giro kiribû heya ku wext hatibû. Romana min a dawîn, XEYB'a min, di destê min de bû.

**Welcome To The United States Of America yan jî Supermuslim**

Gava min qala vê lêpirsîyarîyê kir, ji min re gotin ku ev e tiştekî gelek seyr e wekî çawa di lênihêrîna pasaportan de polîsê pasaportê ji kompûtera xwe ya li pişt camê, berhemên te yên xwerû îronîk şanî te bide û pirsa vê yekê ji te bike, wekî yên di wan wêneyan de tu yî yan na? Jinika Afro-amerîkayî ya li *Balafirgeha Newarkê* ku serê carê deng bi xwe dixist û li gorî nimroyan berê rêwîyên ku ji *bitûmê* dinyayê hatibûn –parîyekî jî bi hêrs– dida *desk*an, bi me da zanîn ku dor dora me ye.

*"Thirty nine! Thirty nine! Thirty nine!"*

*Thirty nine* em bûn. Ka çi di tûrikê min de hebe (pasaportên me, sîgortayên me yên tendûristiyê, belgenameya wîzeya J-1 û J-2'yê, vexwendnameya zanîngehê û ya dezgeha sereke, belgenameya sînorê û yên mayîn) min giş dirêjî polîsê navosere kiribû û li bendî gotina wî mabûm. Polîsê di pişt wê zirecamê re ji nişka ve berê monîtorê dabû min ku berhema min a ku min di sala 2003'yan de çêkiribû û ji duwanzdeh wêneyan dihat pê, şanî min dida. Ne hemû rêzewêne, bi tenê û xasma ew a dawîn. Bi mizicîn ji min pirsî:

"Ev tu yî?!"

"Belê ez im…" min gotiyê. Monîtor cardin rast kir û berê wê veguhest xwe û tiştin lê kirin. Dû re dîsan berê wê bi min ve kir û pirsî:

"Û ev jî tu yî?!"

"*Yes sir*…ew jî ez im…", kenîya û tiştekî din negot, nepirsî jî. Vê carê, berhema min a fotoyê ya ku min serê xwe di nava kefîyeyê ku min di nîvekê re veçirandibû û serê xwe tê re deranîbû, şanî min dabû. Piştî çend pirsên din yên pêwîst, a soxîn em derbasî hêla din bûbûn û me qesta ciyê bahol û walîzên xwe kiribû. Axirî soxirî em li Amerîkayê bûn, herdu berpirsîyarên Beşa *International Student/Scholar Coord. Global Education Centerê* ya Zanîngeha Parêzgeha Montclairê, Stî Angela û Stî Domenica li bendî me bûn. Em mêhvanê malbateke Amerîkayî bûn û bi qasî du mehan yan jî mehek û nîv em dê li wir bijîyana.

**Nasîna derr û dor û kes û kûs û hizr û bîrên seyr**

*Montclair*ê ku girêdayî parêzgeha *New Jersey*yê ye bajarekî mezin, bi pîr û pergal û xweşerengîn e û bi populasyona sivoriyên şûm î berzeq yên hûr û gir ku li ser banên xanîyên şêwê-*Victorian*, çiqlên dar û berên bi heybet, têlên karebayê, peyarê û rêqirê akrobasîyê dikin û di hewş û bexçeyên ku bi gul û kûlîlkên cihêreng xemlandî de bê çawan li ser herdu pepikan radiwestin, terîyên xwe yên sertopikî radikin û wilo ziq li mirovan dinihêrin, bêgûman rengîntir dibû. Min yeke ji wan di nava satila avê de dîtibû ku yexsîrê ji zû de ling kiribûn cot. *Katrina* (profesora perwerdehîyê) û *Gay* (mamostayê zimanê Îtalî), herdu dotên wan *Sarah* û *Tali*, bi hatina me gelekî kêfxweş bûn, bi me û bi rewşa me ya aloz serwext bûn û bi tirkî lêkiribûn postera pêşwazîyê ya bi derîyê me yê li qatê dawîn ve kirî, wekî; *"Hûn bi xêr hatine mala me."* digel du alayan; li milê çepê alaya Amerîkayê, li milê çepê alaya Tirkîyeyê. Demek wiha, bi nasîn û tomarkirina xênî û xanîyan, der û dorê, peyarê û kûçeyên fireh û dirêj yên ji mirovan xalî, seyrangehên ne serî û ne binî û guhdêrana bêdengîyê, temaşekirina ziresiwareyên li tenişta xanîyên du-sê tebeq yên fenanî qesran, çûn û hatina îstgehan û bi kirarîyên nav-zanîngehê û der-zanîngehê derbas bû, bi dû re min xwe gihand çend hevalên xwe yên ji derdora hunerê ku exleb li NYC'yê bi cî bûbûn. Em jî ne dûrî *New York*'ê bûn, di serê gir û girkokên *Montclair*ê re, balaxaneyên *Manhattan*ê û xasma zireavahîya *Empire State*'ê xweş xuya dikir. *Tramwaya Vîyan*ê (2013) ya *Tennessee Williams*î ya ku Kawa Nemir wergerandibû di çavikeke çentepişta min de bû, gava li trênekê yan li *subway*ê siwar dibûm, min jî pirtûka xwe derdixist û wekî gelekan dest bi xwendinê dikir, heya ku hinek pirsan ji min bikin wekî bi kîjan zimanî ye.

Di hevdîtina min a bi sergenîndeya *PEN Americanê Julie Trébault* re de, *Işın* a hevala min a kurator –ku bi wênegira navdar *Susan Meiselas*ê re kar dikir û me jî zanîngehê hev nas dikir– jî hebû, li hundirê wê zireavahîyê, tekane postera mezin û nasyar, ya nivîskar *Aslı Erdoğan*ê bû. Li mal û kargeha *Susan*ê, ez bi wêne û yadgarên li derr û dorê derketim gerr û geştekê li seranserê welêt.


**Li stûdyoyê…**

Hefteyeke bi şûn de, Livia ya gerînendeya Beşa Huner û Sêwiranê ya Zanîngeha Parêzgeha Montclairê, mifteya studyoya min a li *Finley Hallê*, radestî min kir ku di jîyana min ya hunerî de ez yekem car dibûm xwedîyê xwe û stûdyoyekê, belam wekî hunermendê hevçerx î tirk *Huseyin Bahri Alptekin* berîya mirina xwe ya trajîk gotî, ez ne hunermendê stûdyoyê bûm. Min hemû berhemên xwe yên hunerî li mala xwe ya li Amedê, li jûra xwe ya xebatê afirandibû û hizra dûrketina ji mal û jûrê na, lêbelê berhemhênerîya li devereke din û li welatekî din, xasma jî li stûdyoyê bi min gelekî xerîb dihat. Çend caran ez çûm, min derîyê xwe yê stûdyoyê vekir, danişim, çend xêz avêtin ser kaxezê û min kir û nekir, min nekarî xwe ji geremola hizr û bîrên xwe yên ku min ew ji welêt anîbûn, rizgar bikim. Aya hunermendên din bi saetan di stûdyoya xwe de diman, çi dikirin, xasma bi çi û çi mijûl dibûn!? Adetekî min î nexweş hebû, min bi ti teherî guhdarîya muzîkê nedikir wilo bi saetan, muzîk wexteke taybet dixwest û min jî ew wext nedida pê. Ha, li vî welatî ez hînî vê yekê jî bûbûm, anika berguhkên xwe dixim guhên xwe û guhdarîya *Memet Atlî*yî dikim, albûm bi albûm pê de diçim. Lewre, min fam kir ku mirov, li gorî rûpîva xaka xwe difikire, bîr û boçûn û xewn û xeyal jî li gorî wê rûpîvê yan fireh dibin yan jî –mixabin– tengtir dibin û Amerîka, tekane welat e ku bi firehîya rûpîva xwe, hizrên mirovan jî berfirehtir dikir. Belam, ev yek, ji bo tirkên ku pirranî ji Enedolîya Navîn û Deryaya Reş hatibûn û li derr û dora *Paterson*, *Clifton* û *Little Falls*ê akincî bûbûn, ne derbasbar bû. Keçika kuafor a ku digot; "Ev e hevdeh sal e ez li Amerîkayê me, belam ez hînî îngilîzî nebûm, ji bilî axaftina bi çend mişteriyan re û hînbûna çend peyvên vî şixulî, pêdivîya min pê nebû, mirov dikare wehakîno jî bijî…", di esasê xwe de rastîya rêgezeke sosret a ku şîrê çilîtîyê di pozê me re dianî, bi lêv dikir. Li vî serê Amerîkayê be jî, îmana tirk û ereban ji kurdan diçû, ew li alîyekî, belam kurd jî bêtifaq bûn. Têkilî û hevaltîya bi çepgirên tirkan re, ji avakirin yan dûristkirina pêwendîya bi kurdên ji parçeyên din re zehmettir bû qey. Yekcaran muzîkê radiwestînim û xwe davêjim derveyî stûdyoyê; baran hûre hûr lê dike, çixareyek vêdixim…

Baranê danenî, dû re lehî rabû, vedigerim stûdyoyê, tiştekî ku ez bikim tune ye, çend rûpel ji *Bartlebyê Nivîsevan* dixwînim, Kawa her bi min re ye…

***NYC***

Hest pê dikim ku bajarê min NYC ye, ne dereke din.



xwebûn

3-9 Tebax 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 33

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazışleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Kopî ye yan tesaduf e?

Navenda Nûçeyan

Şêwekar Luqman Ehmed li ser malpera xwe ya tevna civakî ragihand ku şêwekar Mehmet Yucel berhemên wî kopî kirine û di pêşangehekê de pêşkeş kirine.

Luqman Ehmed û Mehmet Yucel têkildarî mijarê ji rojnameya me re axivîn. Mehmet Yucel pirsên me bersivandin û wiha got: "Ez li vê herêmê mezin bûme û her tiştê der barê xelkên herêmê de dizanim. Ji çand û baweriyên wan heta bi cil û berg, sembolên wan, deq û motîfên wan baş nas dikim. Derdora 25 sal in ku bi karê hunerê re mijûl dibim. Min li fakulteya hunerên ciwan xwendiye, her wiha min perwerdeya bilind û doktora xwe jî kiriye. Ez navdar û destan û dengbêjiya xelkê herêmê nas dikim û haya min ji Ehmedê Xanî, Cergerxwîn, Derwêşê Evdî, Mem û Zîn, Siyamend û Xecê, Mehmet Uzun û hwd heye. Haya min ji çand û hunera Mezopotamyayê heye."

### Gazinên Mehmet Yucel

Mehmet Yucel gazincên xwe wiha bi lêv dike: "Ez Luqman Ehmed nas nakim, tenê beriya 15-20 rojan min ew bi tesadufî nas kir, dema min dît ku min li ser malpera civakî dişopîne. Heta piştî ku min tabloyên wî dîtin min ji rengê wî hez kir. Ji ber koleksiyona min heye, min xwest tabloyekî wî bikirim lê wî bersiv neda min. Dibe ji min fêm nekiribe, ji ber min bi tirkî jê re nivîsandibû. Ji 10'ê tîrmehê şûn de gelek name û çêr ji min re hatin. Piştî wê ev mesele li ser tevna civakî hate parvekirin û çêr û sixêf li min hatin kirin û hê jî berdewam dikin. Heke idiayeke mirov hebe bi vî rengî nabe, xwezî berê ez naskiribûma, wê gavê wê zanîbûya ku ez deng û vedenga dîrok û rabirdûya xwe me. Hunermendî ne wiha ye û tew ku mirov ji heman miletî be nabe bi vî rengî bi çêr û heqaretan mirov nêzî hev bibe. Hemû not û reşnivîsên xebatên min li ba min hene. Her wiha di resimên min de ez kompozisyoneke cuda bi kar tînim; ez mijarên xwe bi şêweyê li ser dirêjahiyê û li ser firehiyê an jî panbûnê bi kar tînim. Ew wêneyên ku Luqman wekî mînak nîşan dane navê wan û çîroka wan heye. Ez motîfên ku di tejikan de, di cil û bergên herêmî de, deqên li rû û laşê mirovan ên vê herêmê baş nas dikim û agahiyên min der barê wan motîfan û dîroka wan de jî heye. Wekî mînak resmê min ê Gemiya Nûh û tava ku li paş wê hatiye bikaranîn çawa Luqman dibêje ev û ya min yek in. Jixwe her miletek sembolên wî hene, gelek kes dikarin heman sembolan bi kar bînin."

### Bila ev bibe dersek


Luqman Ehmed jî got ku armanca wî ne tenê parastina berhemên wî ye, armanc pêşîgirtina li talanê ye û wiha pê de çû: "Bi salan e ku stranên me, çîrokên me, destanên me û heta bi xwarinên me jî tên dizîn û bi navê gelekî din tên belavkirin. Lewre jî dema ku min dît ew tabloyên min hatine kopîkirin min xwest ku ez vê yekê teşhîr bikim û bala her kesî bikişînim ser vê mijarê."

### Ne malê talanê ye

Ehmed axaftina xwe wiha berdewam kir: "Ew camêr dibêje em her du kurd in an jî wekî bilêvkirina wî dibêje em her du ji miletekî ne. Lê ez dixwazim di vê de mînakekê bi bîra wî bixim. Îbrahîm Tatlises jî kurd e lê wî bi sedan stranên kurdan dizîne û ew kirine mal û milkê miletekî din. Ne tenê destan çîrok û stranên me dizîn, heta bi xwarinên me jî tên dizîn û li ser navê milet û gelên din li dinyayê belav dibin. Lewre jî divê êdî pêşiya vê talanê were girtin û em bi xelkê bidin naskirin ku malê me ne malê talanê ye û min xwest ku ev bibe mînak û dersek ji bo ku kesekî din beriya çavê xwe berde ked û berhemên me, sed caran bifikire û newêribe bi hêsanî berhemên me talan bike."

Luqman Ehmed got ku wî parêzerê xwe xistiye dewrê û wiha domand: "Ew payama ku ji min re şandiye û mijar tev êdî li ber destê parêzerên min e. Saziyên navneteweyî yên mafê telîfê diparêzin hene û heta dawî ez ê vê mijarê bi rêya parêzerên xwe jî bişopînim."

Ehmed di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ev helwesta min ne tenê ji bo parastina berhemên min e. Ev bangek e ji bo pêşîgirtina li talaneke ku bi sedan salan e li dijî çand û hunera kurdan tê kirin. Her wiha helwesteke tund e li hemberî kesên ku wê wêrekiyê û wî mafî di xwe de dibînin ku bi hesanî keda mirovan bikin ya xwe. Tiştên ku dibêjim û min bar vekirine li ber çavan e û ne tenê şêwekar her kes dikare li wan tabloyan mêze bike û der barê wan de biryara xwe bide."




## Hunermendek din jî gilî dike

Li aliyê din, nerazîbûneke bi vî rengî ya hunermendê kurd Ganî Mîrzo jî li ser malpera wî ya civakî hatiye belavkirin û tê de wiha tê gotin: "Şîrketa muzîkê ya bi navê Saz Blackê ku navenda wê li Stenbolê ye, li ser înternetê berhemên min bi rêya hin malperên wekî Amazonê û yên din difiroşe. Tevî ku tu têkiliya min bi wê şîrketê re tune ye, wekî ku ew berhem li wê şîrketê hatibin çêkirin tên firotin." Hunermend Ganî di berdewama axaftina xwe de dibêje ku hemû berhemên wî li komeleya hunermendan a Spanyayê tomarkirî ne û ew dê giliyê wê şîrketê bike.

# Nerehetiya pez ji şivanê nezan e

Felat Nishtiman

Edhem Manaz 27 salî ye û ji gundê Kilêsiyê yê li ser Farqîna Amedê ye. Ew di tevahiya temenê xwe de, tenê carek li derveyî bajêr xebitiye, wekî din her tim li ber pezê xwe bûye. Edhem zewicandî û zarokek wî heye. Ew bi bav û birayekî xwe re li gundê xwe şivaniyê dike.

Şivanî, pîşeyê bav û kalan ê Edhem Manaz e. Berê li gelek gundên derdorê şivanî kirine lê piştre wan dest bi şivaniya pezê xwe kiriye. Bi gotina Edhem, ji bav û kalan de hinek jî ji ber erdê wan tune bûye, ew neçar bûne şivaniyê bikin û êdî şivanî bûye parçeyekî jiyana wan û her tim pê debara xwe kirine. Ew bi lêv dike ku ew bixwazin jî nikarin dev jî xwedîkirina pez berdin.

Edhem Manaz ê ciwan, heya dibistana navîn dixwîne lê ji ber hewya wî li xwendinê nayê dev ji dibistanê berdide û êdî diçe ber pezê xwe. Ew dibêje ku wî xwe dîtiye nedîtiye şivaniyê dike û wiha pê de diçe: "Ji min re bûye wekî kurm, wekî ehlaq. Ez jê aciz nabim. Em li ber pezê xwe ne, naçin şivaniyê. Pezê me yê malê jî yê bazirganiyê jî heye. Ji ber kêfa me jê re tê, em bêyî wî nikarin îdare bikin. Eynî zirar be jî em diçin berê."



Ew tevî malbata xwe salik dozdeh meh pez xwedî dike. Beşek pezê wan ê malê yê ji bo dotinê, beşek jî yê bazirganiyê ye. Salekî salewext bi gir û hûran nêzî hezar mih û berxikî dikirin û diforişin lê ji ber cihê wan teng e û berga wan tune ye, li ser hevdu herî zêde 200-250 pezî dikarin xwey bikin. Edhem da zanîn ku ew li herêmê bi xweyîkirina pez tên nasîn û loma jî di kirîn û firotina pez de qet zehmetî nabînin. Ew bi piranî ji derdorê pez dikirin û dîsa diforoşin derdorê.

Edhem dibêje ku ew û birayekî xwe ne lê hema bêje ew tenê li pezê xwe dinêre û diyar dike ku rojekê jî neçe ber pez, li malê aciz dibe û didomîne: "Dema diçim ber pez, wekî ku dinya tev dibe a min. Wisa ji min re bûye kurm, ji ber ku ez zewq jê distînim. Eynî li min bûye wekî kurmê cixarê, nikarim dev jê berdim. Wexta pez difiroşin, ez dibêjim de wa çû ez ê hinekî bîna xwe bidim, deh roj derbas dibe bêhna min teng dibe. Ez du rojan neçim berê wekî ku salekê neçûbim berê."

Di berdewama axaftina xwe de, Edhem destnîşan dike ku cudahiya kirina karê xwe û yê xelkê bi qasî erd û esman e û dibêje ku ew heta niha tenê carek (7-8 mehan) li derveyî bajêr di karê înşaetê de xebitiye û wiha dibêje: "Karê xelkê zehmet e. Wexta ez karê xwe dikim kes nikare minetê li min bike. Îmkanên meriv hebin, meriv dikaribe karê xwe bike çêtir e ji karê xelkê. Gava herkes karê xwe bike, wê çaxê herkes dibe xweyî kar."

Ne tenê ji bo debara xwe pê bikin lê di heman demê de ew ji xweyîkirina pez pir hez dike, loma jî ew pir bi baldarî û zanebûn li pezê xwe dinêre. Edhem her wiha di xweyîkirina pez de ji nava xwe têr e û dibêje ku şivanekî temenê wî tev bi şivaniyê jî çûbe, ew nikare bi wî re şivaniyê bike û van tiştan tîne ziman: "Ez birçî dimînin, reht dibim lê nahêlim pezê min aciz bibe. Ez nahêlim pezê ber min, îxanet lê bibe. Yek li ba min li pez bixe, pir li zora min diçe. Tu pê re xayintiyê nekî, ew jî te aciz nake. Pezê ku nerehet e, şivanê nezan li ber wî pezî ye."

Ethem Manaz der barê şert û mercên zor û zehmet ên xweyîkirina pez de jî dide zanîn dike ku êdî pir kes wekî berê nikarin heywan xwedî bikin û axaftina xwe wiha bi dawî dike: "Bi hinekan re xirûr çêbûye, naxwazin şivaniyê bikin, yên bixwazin jî newêrin. Li aliyê çiyê şivan dibêjin, leşker bi şev pêşiya wan digirin û gule li wan direşînin, wan ditirsînin. Ji vê qasê şert giran bûne; gelek kes newêrin heywan xwey bikin. Berê her tişt ne kirîn bû; rûn, qatix, penêr tev ji vî heywanî bû. Heywanê berê evqas nexweş jî nedikêt. Berê pir dihat xweykirin taleb jî hebû."